

# Mûye mirov dibe dezî dezî

**Dema mirov gotinên Davut Akyon ê bûye şahidê bûyerê dibihîze mûyê mirov ji canê wî radikişe. Cenazeyê endamên PKK'ê û sivîlan bi leşên heywanan re defin kirine**

### MIROVAHÎ JI MIROVAHIYA XWE ŞERM DIKE

Li Kerboranê ya Mêrdînê di gora tomarî ya cenazeyên PKK'iyan de kesên sivîl û heywan jî hatine definkirin. Birayê Nedîm Akyon ê 13 salî di 1995'an de bi 6 kesan re hatibûn binçavkirin û piştre jî agahî jê negirtibû girtin Davut Akyon, diyar kir ku ew bûye şahidê definkirina cenazeyê 4 endamên PKK'ê û cenazeyên sivîlan a bi leşên heywanan re li heman herêmê hatine definkirin. Ev îdia pirsa "Kesên hatine windakirin dibe ku bi leşên heywanan re hatibin definkirin?" tîne hişên mirovan.

### BÛYERÊN LI BOTAŞ Û BASÎSKÊ ANÎ HIŞÊ MIROV

Akyon, daxuyand ku ji bo aqûbeta birayê xwe hîn bibe di sala 2005'an de serî li ÎHD'a Mêrdînê da lê heta niha tu encam negirtiye. Gotinên Akyon ên ku bûye şahidê bûyera hovane, cenazeyên bi leşên heywanan re hatine definkirin di kolandinên di çarçoveya dozên bûyerên kiryar nediyar de hatine kirin ên li Noqteya Lêgerîna Botaşê ya Silopiyê û gundê Basîskê ya Cizîrê hatine kirin hestiyên sewalan derketibûn. Divê vê hovîtiya ku hatiye kirin aşkera bibe... *RÛPEL - 3*

ROJEV
25 Nîsan - Yekşem 2010 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 kr Hejmar: 26

### Çima hestiyên heywanan?

Heta niha gelek îtîrafkarên JÎTEM'ê, şahid û mexdûran der barê hestiyên welatparêzên kurd ên bi awayekî hovane bê mehkeme hatine qetilkirin de agahiyên girîng û aşkera dane. Li cihên ku hatine diyarkirin hestiyên mirovan derketin jî piranî di Tiba Edlî de 'hestî yên sewalan e' derdikeve...

Tayip TEMEL - R.2

# Jinên kurd hîmên yekitiyê avêtin

Li Amedê bi beşdariya jinên kurd ên her çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd hate lidarxistin. Bi pêkhatina vê konferansê di nava kurdan de hîmên yekitiya neteweyî hate avêtin û kurd zêdetir nêzî hev bûn

### LI AMEDÊ GAVEK DÎROKÎ HATE AVÊTIN

Li Amedê Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd dest pê kir. Jinên siyasetmedar, akademîsyen, nivîskar, hunermend û nûnerên saziyan ên li çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê tevlî konferansê bûn. Endama Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk Mulkiye Bîrtane, axaftina vekirinê kir û diyar kir ku ev konferans ji bo jinan gavek dîrokî ye.

### ZANA: CEJNA RONESANSA JINÊN KURD E

Parlamentera DEP'ê ya berê Leyla Zana, diyar kir ku barê jinên kurd gelekî giran e, ji ber ku jinên kurd hem ji bo nasnameyê û hem jî ya zayendî têdikoşin. Zana, destnîşan kir ku bi vê konferansê îro "Cejna ronesansa jinên kurd e" û hêvî dike ku ev gihîştina jinan bibe sedema konferansek neteweyî ya kurd.

### KONFERANS ÎRO JÎ BERDEWAM DIKE

Konferansa Jinên Kurd îro jî bi rûniştînên weke 'Di nava pêvajoya têkoşîna demokratîk de rolên nûnertiyê yên jinan û perspektîfên bihurandina zayendparêziya civakî' û 'Rêbazên jinan ên avakirina piştgiriya neteweyî ya demokratîk' pêk bên. Di encama konferansê de dê encamnameya konferansê ji raya giştî re bê aşkerakirin... *RÛPEL - 7*



*Li Amedê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) û Leyla Zanayê, Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd a bi navê "Di pêşvebirina demokrasiyê de rista jinan" hate lidarxistin. Konferans bi beşdariya 150 delegeyan li salona Resepsiyonê ya Parka Sumerê dest pê kir. Ji parçeyên cuda nûnerên jinan tevlî konferansê bûn.*

### Amed mala jinên kurd e

Di çarçoveya konferansê de kokteylek hate lidarxistin. Di kokteylê de hate destnîşankirin ku Amed mala hemû jinên kurd e. Her wiha 40 jinên ku ji başûrê Kurdistanê hatibûn bi kulîlkan hatin pêşwazîkirin... *RÛPEL - 7*

POLÎTÎKA



## Komeleya Gelê Azad vebû

Komelaya Gelê Azad a Taxa Yenimahaleyê bi beşdarbûna sedan kesan bi merasimekê hate vekirin. Di vekirina Komeleya Gelê Azad de hate destnîşankirin ku armanca komeleyê pêşxistina demokrasiyê ye...

R4

POLÎTÎKA



## Vê carê dest avêt Licê

Terîqeta Gulen vê carê jî dest avêt Lîcê ku cihê wê di têkoşîna azadiya kurdan de girîng e. Terîqet, di bin navê holên xwendinê yên EHÎDER`ê de xwe bi rêxistin dike û xebatên avakirina malek ya xwendevanan dike...

R4

ÇAND



## Dersa fîzîkê hate dîtin

"Dibistana Azad" ya ku ji aliyê TZPKurdî ve bi armanca pêşvebirin û hînbûna kurdî hatiye avakirin di hefteya 3'yemîn de dersa fîzîkê da. Dersa fîzîkê ya 'Dibistana Azad' bi neynikan dest pê kir...

R9

## Divê bi rastiyê re hevrû bibin

Hevserokên BDP'ê Gultan Kişanak û Selahattîn Demîrtaş anîn ziman ku bûyerên 1915'an hê jî di wijdana mirovan de cihê xwe diparêze û wiha gotin: "Tirkiye 95 sal in vê pirsgirêkê nabîne û tune dihesibîne û êdî bi vê pirsgirêkê re rû bi rû mayîna Tirkiyeyê divê pêk bê."... *R.5*

## Derewa 95 sal in pêk tê hat nîqaşkirin




Roja 24'ê Nîsanê tevkujiya ermeniyan pêk hat. Bi minasebata wê rojê gelek çalakî hatin lidarxistin. Li Enqereyê bi mijara komkujiya ku li dijî ermeniyan pêk hatibû bi beşdariya akademîsyen û rewşenbîran sempozyumek pêk hat. Hate gotin ku divê ew derewa 95 salan nîqaş dikin. Fîkret Başkaya da zanîn ku dîroka fermî li ser rastiyan girtî ye û ev bi destê dîroknasên fermî pêk hatiye. Başkaya bilêv kir ku divê ew derewkaran teşhîr bikin... *RÛPEL 5-6*

www.arsivakurdi.org



Samî
Tan
sberbeyan@yahoo.com

# Ma em mazoşîst in?

Di şer û pevçûnên gundiyan de hinek kesên kone hebûn. Dema ku wan dixwest li yekî bidin di nav xwe de plan û bernameyek amade dikir û karbeşî dikir. Li gorî vê plangeriyê diviya yekî ji wan belaya xwe di neyarê wan bida û yê din jî "navbeynkarî" bikira. Lê navbeynkar nedihişt ku hevalê wî lêdanê bixwe, dikir ku neyarê wan lêdanê bixwe.

Dema ku ez bala xwe didim rewşa kurdan û dewleta tirk ev şerê gundiyan tê bîra min. Navbeynkarê me jî lîberalên tirk in. Xwe wisa dikin ku em zêdetir lêdanê bixwin. Ji bo ku ew du peyvên xweşik der barê me de bibêjin, divê ji lêdanê em ji hev bipelişin, hal di me de nemîne.

Ev hest û raman çawa bi min re çêbûn? Bûyerên ku li Tirkiye û Kurdistanê pêk tên û nirxandinên rewşenbîrên lîberal ên tirk vê hest û ramanê bi mirov re çêdikin. Ew bi darê zorê dixwazin kurdan bikin dûvikê dû hebanê. Li gorî baweriya wan AKP çendî kurdan bide girtin, zilm û zordariyê li wan bike jî kurd divê bêyî qeyd û şert piştevaniya polîtîkayên AKP'ê bikin.

Li gorî baweriya wan li ber kurdan du rê hene; yan ew ê xwe bidin aliyê partiyên rêgezperest û kemalîst an jî dê bibin piştevanên AKP'ê. Heke naxwazin bibin hevalbendên CHP û MHP'ê, heke aştî û demokrasiyê dixwazin, divê bibin piştevanên AKP'ê, wê bi tenê nehêlin. Çima? Ji ber ku AKP guherînê dixwaze.

Belê AKP guherînê dixwaze, lê guherîneke çawa û ev guherîn ji bo kurdan çi bi xwe re tînin. Ew qet qala vê yekê nakin, lê em hinekî qala vê yekê bikin. Heta niha guherînên ku bi AKP'ê re hatine, tu destkeftin ji bo kurdan neanîne. Hemû gavên AKP'ê ji bo şikandina îradeya gelê kurd û belavkirina Tevgera Azadiyê ne. Hemû kar û bizavên AKP'ê ji bo pêkanîna desthilatiya bîrdozî ya dewletê ne.

Rast e rengê desthilatiyê diguhere, AKP xwe di hemû warên desthilatiyê de birêxistin dike, heta bi vê yekê jî namîne xwe di nava civakê de jî bi rengekî taybet bi rêxistin dike. AKP serê pêşîn di nav karsazên nûhatî de xwe birêxistin kir. Heta mirov dikare bibêje ku AKP'ê dewlemendên nû afirandin, gelek kes ji saya serê AKP'ê dewlemend bûn. Piştre jî bi sedeqe û zekatên wan dewlemendên nûhatî û afirandî, AKP di nava civakê de xwe birêxistin dike. Ev rêxistin naşibe, rêxistinên din. AKP pêşî mirovan birçî û xizan dike, piştre hînî parsekiyê dike. Li ser vê bingehê jî bi parsa belav dike, mirovan bi xwe ve girêdide.

Belê AKP guherînê dixwaze, lê ev guherîn li ser bingeha têkbirina hêzên mafparêz û azadîxwaz pêk tê. AKP li Tirkiyeyê heta radeyekê desthilatiya xwe pêk aniye, lê belê têkoşîna gelê kurd li ber desthilatiya wê wekî kelem xuya dike. Ji ber vê yekê jî ew bi destekî xwe li hemberî kemalîstan şerê desthilatiyê dike, bi destê din dixwaze me tepeser bike. Ji ber vê yekê qanûnên ku AKP'ê derxistine ji qanûnên berê xerabtir in. Berê rojnameyê me bi hinceta propagandaya cudaxwaziyê dihatin girtin, niha bi hinceta ku propagandaya rêxistina nehênî têne girtin. Ev "qanûna li dijî terorê" di dema AKP'ê de hate derxistin. Bi vê qanûnê bi hezaran siyasetmedarên kurd, zarokên kurd hatin girtin. Ev jî guherînek bû, gelo em ê çima piştevaniya guherînên wiha bikin? Her wekî Dengîr Firat gotî, Ma em mazoşîst in? Helbet em ne mazoşîst in û lê hinek sadîst ji zilm û zordariya ku li me tê kirin, dilxweş dibin.

Bêguman bi hişmendî tevgerandin riya herî baş e. Hişmendî; di wateya di rewşa herî aloz de jî helwesteke zanayî û baqilane nîşandayîn e. Bi awayekî bêhnfireh li mijareyan kûr bûne

# Tevgerîna hestyarî, hişmendî û şarezayî

FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ

Mirov di rewşên aloz de, wek şîn û şîwan, dema dijmin bi bêbextî û cinawirî êrîşî; zarok, jin, kal, mirov, nas, gel, netewe, serok û rêberên mirovan dike, mirov bixwaze û nexwaze jî, ji ber ku tahrîk li ser hest û giyana mirovan heye, mirov di pêngava yekemîn de bi hestyarî tevdigere, bertekeke tund nîşan dide, li encama bertekê nanêre.

Dijmin jî ku navê wan hêzên tarî, serkarên dewletê, Ergenekon e, çi dibe, bila bibe, bi salan e, bê navber bi mebesta tahrîkkirina giyan, hêza derûniyê û tevlihevkirina hestê me bi dirindetî êrîş dike. Hema em wek mînak, nûçeyên yek rojekê, ya roja 19'ê avrêlê di nava nûçeyên ANF'ê de wek serenivs hebûn, bigirin, dê em ê vê rastiyê bibînin.

"Guleyên MKE'yê danîn ber derê BDP'ê . Xebatkarê rojnemeya Azadiya Welat hat revandin û derbkirin. Ji bo 2 zarokên kevir avêtine, doza 'endametiya rêxistinê' hat vekirin. Li Cizîrê du zarok hatin destgîrkirin. Li Giresun û Gumuşhanê hewl dan ku karkerên kurd lînc bikin." Roja wî maşeyê hêzên tarî ku tên zanîn li Samsûnê bi gurmistê êrîşî birêz Ahmet Turk kir, hemû kurdan ev êş di giyana xwe de rabihîstin, hestê giştan hat tehrîkkirin, hêrs û gira giştan derket qada herî berz. Li rojê pey jî rojname û qelemên hêzên tarî yên wek Y. Ozdil bi nivîsên tehrîkar çawa ku bi barûd û benzînê di ser me de werin, bi wî awayî ji reşahiyê pekiyan. Di rewşê wiha êrîş li ser êrîşê de ji bandora hestyariyê filitîn, helwesteke hişmendî û şarezayî nîşan dayîn, ne hêsan e.

Bêguman bi hişmendî tevgerandin riya herî baş e. Hişmendî; di wateya di rewşa herî aloz de jî helwesteke zanayî û baqilane nîşandayîn e. Bi awayekî bêhnfireh li mijareyan kûr bûne. Em vê awayê helwestê li ba Hz. Zerdeşt, Manî, Halacî Mansûr, Ehmedê Xanî û sofîstên kurd yên din dibînin. Birêz Ahmet Turk di wê rewşa aloz de jî, ev hişmendiya şarezayî nîşan da ku bikane pêşî li karesetan û armanca vê êrîşê bigire. Bêguman ev serbilindiya me hemûyan e.

Mijara şarezayî jî mijareyeke çandî, dîrokî û civakî ye. Li hemberî êriş, rûdan û karesetan helwesteke rewşenbîrî û sofîstî li ser têkiliya mirovbûnê nîşan dayîn e. Di mijara aştiyê de em vê helwesta şarezayî bi giştî li ba Tevgera Azadî û di helwesta birêz Ahmet Turk ya li pey vê bûyarê de dibînin. Ji ber vê rawestana hişmendî û şarezayî dostan jî û dijminan jî li hember wê helwesta birêz Ahmet Turk rêz girtin. Bêguman ev aliyê şarezayiya kurd û çanda kurd e. Em bi tevahî bi vê helwestê serbilind in.

Serkar û dewleta tirk di warê şarezayîyê de ji normên mirovahiyê dûr in. Çawa birêza Dr. Işik Iscenlî jî di nivîsa xwe ya bi serenîvsa "Ji hespê peyabûn!.." de nivîsiye. Ew hîna ji hespê peya nebûne, hîna bi wê hestên dema barbariya êrîşkar dijîn. Ji mijara şarezayiyê gelek dûr in. Loma di dîroka wan de aştî, lihevhatin, ji mafên mirov û gelan re rêzgirtin, bi kurtî bi awayekî mirovî tevgerîn tune. Tenê êrîş, kuştin, rûxandin, sotin, tunekirin, înkarkirin, hest û giyan tehrîkkirinê dizanin. Ji bo vê her kom û komikên xwe ji qada çapemeniyê bigire hetanî komên êrîşkar afirandine, jehra nijadperestiyeke tund zerkê mêjiyê wan kirine. Dê em ê, yan jî bi giştî Tevgera Azadî bikane şarezabûn, mirovbûn û hişmendiyê bi wan derdorên hof û hêr bidin fêrkirin, ne zelal e, wê dem nîşan bide!

Li hemberî vê rewşê kom û komikên me kurdan yên nijadperest, olperest nînin, muhalefeteke kêrhatî jî tune ku bi kêmasî di warê çapemeniyê de hinek gaza dilê me berde, yan jî bi awa û metodên wan bêhna wan biçikîne ku ew bi Tevgera Azadî re têkevin nava dialogê û pirsgirêkê çareser bikin. Kom û komikên hene ku hebûn û nebûna wan nexuyane, ew jî li dor dûvê AKP'ê li ba dibin. Loma jî hemû bar li ser milê Tevgera Azadî maye.

Ji ber van rastiyan carna mirov di tengasiyê de dimîne ku hetanê kîjan radeyî bi hişmendî û şarezayî tevbigere, ji kîjan niqirî pêve wek heciyê kulikê xwe datîne aliyekî û dibêje: "Hecî tu hinek li vir rawest e, ez carê dilê xwe rehet bikim, ez ê cardin werim te hildim!" Mirov hevsarê bozê rewan berde û wê hestê hatî tehrîkkirin, giyana hatî rûxandin, bitêrîne û wê gaza hêrs û girê berde. Di vî babetî de em di divêtiya fetisandina hestên xwe de dimînin.

Encam: Dema mirov rastiyan baş dinirxînê, dibîne ku ji hişmendî û şarezayî çêtir tiştekî din nîne. Tenê bi hestyarî tevgerîn, bêguman bi zêdehî zirarê dide. Dibe ev jî mijara nîqaşê be!

## Deng: Çima ji çalên mirinê hestiyên heywanan derdikevin?

TAYÎP TEMEL tayiptemel@walla.com

Heta niha gelek îtîrafkarên JÎTEM'ê, şahid û mexdûran der barê hestiyên welatparêzên kurd ên bi awayekî hovane bê mehkeme hatine qetilkirin de agahiyên girîng û aşkera dane. Her çiqas carna li cihên ku hatine diyarkirin hestiyên mirovan derketin jî piranî di lêkolînên Tiba Edlî de encama 'hestî yên sewalan e' derdikeve. Bêguman sedemên vê yekê hene. Nûçeya Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DÎHA) ya ku duh der barê mijarê de servîskirî xwîna mirov dicemidîne û bi mirov wiha dide gotin; 'Ev qas jî nabe. Ma kesekî ku ji xwe re bêje mirov dikare vê hovîtiyê bike?'

Nûçe wiha bû; 'Li Kerborana Mêrdînê goreke tomerî hate dîtin û hate îdiakirin ku 6 welatiyên sivîl û çend endamên PKK'ê jî di wan goran de bi awayekî tomerî hatine binaxkirin. Birayê Nedîm Akyon 13 salî yê ku di nav 6 kesên windakirî de ye, Davut Akyon diyar kir ku wî bi çavê xwe dîtiye dema ku leşkeran cenazeyên 6 sivîlan û 4 PKK'iyan tevî leşên hewyanan di çalê de veşartiye. Vê îdiayê rê li ber şîroveyên 'Gelo li Botaş û Kuştepe jî kesên hatine windakirin û sewal bi hev re avêtin bîrên asîdê û ji ber wê yekê hestiyên heywanan ji wir derketin?' vekir.

Ev beyan her çiqas di asta îdiaya mexdûrekî JÎTEM'ê de bin jî li devereke din a cîhanê bûya dê erd û ezman bihejanda. DÎHA'yê ev nûçe servîs kir û em bi hev re dê bibînin ka dengvedaneke çawa derdikeve holê.

Wekî tê zanîn li ser îtîrafên Endamê JÎTEM'ê Abdulkadîr Aygan û çend agahiyên kesên ku şahidiya cînayetan kiriye li Botaş û Kuştepe lêkolîn hatibûn kirin û bîrên asîdê hatibûn vekirin. Di encama lêkolînên li ser hestiyan de Tipa Edlî wiha gotibû; 'Ev hestî yê heywanan in'.

Belê Tipa Edlî wisa digot, lê yên ku bi destê xwe cînayet kirine yên wekî Kamîl Atak, çend kesên din ên wekî Abdulhekîm Guven û Abdulkadîr Aygan bi nav û nîşan cihê bûyeran vedigotin û bi xwe aşkera dikir ku wan jî di gelek bûyeran de cih girtiye.

Dema mirov ji aliyê mantiqî ve li mijarê binêre, pirsa; 'çi karê hestiyên heywanan di bîrên asîdê de heye' tê bîra mirov.

Belê pirsa esasî ev e; Çawa dibe ku sewalên hestiyên wan bi qasî yên mirovan mezin û stûr dikevin hundirê wan bîrên ku di nav sînorên ewlekariyeke mezin de?

Diyar e ku qatilên navnîşan û efendiyên wan diyar bi profesyoneliyeke mezin karê kiriye û li hemberî rîska 'dibe ku pêşerojê deşîfre bibe' tedbîrên xwe girtine. Ango her wekî şahidê qetlîama hovane ya li Kerboranê pêk hatî Davut Akyon jî gotî dibe ku 'laşên heywan û cenazeyên welatparêzên kurd bi hev re avêtibin bîrên asîdê.

Îhtîmaleke din jî heye bêguman. Wekî tê zanîn ev îdia û îtîraf di sala 2004'ê de ji rojnameya Ozgur Gundemê re axivî û yek bi yekê behsa kirinên xwe kiribû. Bîrên asîdê jî di sala 2009'an de hatin rojeva daraza Tirkiyeyê û hin ji wan hatin vekirin. Ev jî tê wê wateyê ku di navbera dema bûyer deşîfre bûyî û vekirina bîran de 5 sal derbas bûne. Bêguman zana û zanyar baştir dizanin lê li gorî agahiyên ku ew didin jî di nava asîdê de 5 sal bes in ku hestî bihelin an jî bên guhertin. Ango kêm be jî îhtîmal heye ku ew hestiyên mirovan bi yên sewalan hatibin guhertin an jî bi yên sewalan re hatibin tevlihev kirin.

Îhtîmal çibe bila bibe, lazim e ev îdiaya ku xwîna mirov dicemidîne û mirov matmayî dihêle bê lêkolîn. Ên ku bi hezaran mirovên bêguneh qetil kirine bêguman dikarin hovîtiya 'binaxkirina cenazeyên mirov û heywanan bi hev re' jî bikin û ev yek ji wan ne dûr e.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mehdi TANRIKULU
Yönetim Yeri:
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstiklal mah. İstiklal. Cad. No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

# XAÇEPIRS


**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Rengek, binevşî... Pirsek di rewşa ne tewandî de... Daçekek **2.** Bi erebî "ez"... Sarincên avê yên di binê erdê de **3.** Pirsek di rewşa tewandî de... Deng, sewt **4.** Şaxên nebatên weke zebeş, petêx, kundir hwd. yên li ser erdê... Notayek **5.** Rengek... Peyveke teşwîqkirinê **6.** Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Elementên ne metal, mîna klor, fosfor û oksîjenê **7.** Peyva neyînî... Birayê bavê mirov **8.** Ode... Tîpên navîn ê "saet"ê **9.** Paytexta Norwecê... Stokholm paytexta kîjan welatî ye

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Ajala xwedî têjik... Xwarina sereke **2.** Eşîr, qebîle, hoz... Rêxistina polîsan a naziyan **3.** Notayek... Banga ji bo nimêjê **4.** Mektûb... Sedemkarê tevgerê, paldêr **5.** Kevok... Yezdanekî misrî **6.** Bi soranî 'av'... Gerestêrkek **7.** Kurteya beriya zayînê... Navçeyeke Elezîzê **8.** Daçekek ku wateyê xurt dike... Xwîşka bavê mirov... Dengdêrên "pêça"yê **9.** Tiştên ku ji nifşên berê hatine wergirtin... Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | O | L | | L | E | M | | E |
| 2 | E | | A | K | A | M | | A | B |
| 3 | M | Û | S | A | | R | O | M | A |
| 4 | Î | | T | | S | | X | E | |
| 5 | | J | | Ş | Ê | R | | D | A |
| 6 | P | I | D | Î | | E | M | | A |
| 7 | A | | A | N | O | N | Î | M | |
| 8 | P | I | S | | J | Î | | O | F |
| 9 | A | R | Î | Ş | E | | I | R | A |



www.arsivakurdi.org

# Mirov û sewal bi hev re çal kirin!



## 4 jê zarok 7 kesên di 29'ê cotmeha 1995'an de li Kerboranê ji aliyê leşkeran ve di encama serdagirtina malan de hatibûn binçavkirin û piştre jî tu agahî ji wan nehatine girtin bi leşên sewalan ve hatine çalkirin

Li navçeya Kerboranê ya Mêrdînê di gora tomarî ya cenazeyên PKK'iyan de kesên sivîl û sewal jî hatine definkirin. Birayê Nedîm Akyon ê 13 salî yê di 1995'an de bi 6 kesan re hatibûn binçavkirin û piştre jî agahî jê negirtibûn. Davut Akyon, diyar kir ku bûye şahidê definkira cenazeyê 4 endamên PKK'ê û cenazeyên sivîlan a bi leşên sewalan re li heman herêmê hatine definkirin. Ev îdia pirsa "Kesên hatine windakirin dibe ku bi leşên sewalan ve hatibin definkirin?" tîne hişên mirovan.

Birayê Nedîn Akyon ê 13 salî yê ji 6 kesên hatin binçavkirin Davut Akyon, anî ziman ku bi salan in serpêhatiyên xwe veşartine û wiha got: "Birayê min Nedîm Akyon di sala 1995'an de ji aliyê leşkeran ve hate binçavkirin û pişt re jî me tu agahî jê negirtin. Birayê min li cem min birin. Piştre ez çûme Fermandariya Leşkeran a Navçeyê. Min pirsa birayê xwe kir. Ji min re gotin 'me birayê te berda' lê birayê min bernedabûn."

Akyon, bi lêv kir ku serî li Dozgeriya Komarê ya Kerboranê da û li ser vê yekê Dozgerî jî li leşkeriyê geriyaye û leşkeriyê ji dozgeriyê re gotiye "Di destê me daye. Em ê di nav 2 û 3 rojan de derxin dozgeriyê. Piştre jî êdî min birayayê xwe nedît. Li gorî em hînbûn 7 kes di îşkenceyên dijwar re derbas kirin. Li ser laşê wan naylon helandine." Akyon, da zanin ku ji sala 1995'an heta niha li birayê xwe digere û wiha dom kir: "Em lêgerîna xwe di domînin. Li vir gelek operasyon, pevçûn û înfaz çêbûn. Li ku derê cenazeyek hebe an jî cenazeyekî PKK'iyekî bê definkirin ez diçim bera xwe dideme û dibêjim ku 'dibe ku birayê min be' lê heta niha ez rastî birayê xwe nehatim." Akyon, daxuyad ku ji bo aqûbeta birayê xwe hîn bibe di sala 2005'an de serî li ÎHD'a Mêrdînê da lê heta niha tu encam negirtiye.

Akyon, destnişan kir ku dema li birayê xwe digeriya li Kerboranê rastî gelek bûyeran hatiye û wiha dirêjî da axaftia xwe: "Di sala 1995'an de li Kerboranê dê pevçûnekê de 4 endamên PKK'ê jiyana xwe ji dest dabûn. Cenazeyên PKK'iyan ji aliyê leşkeran ve li gundan dihatin gerandin. Min got 'dibe ku birayê min be' çûm û min bera xwe da cenazeyan. Lê birayê min di nav wan de nebû. Cenaze yek jê jin û 3 zilam li riya Bendava Ilisuyê ya derketina Kerboranê hatin definkirin. Leşkeran cenaze li qada ku wê demê şaredariyê çop lê kom dikirin defin kirin. Bi kepçeya şaredariyê ve çalek mezin vekirin û piştre jî cenaze bi hev re avêtin çalê û çal girtin. Ez texmîna çalê zanim. Wê demê hemû kesî wekî min dît lê ji ber tirsê nabêjin."

Davut Akyon, diyar kir ku riya Bendava Ilisuyê heta sala 2000'an jî herêma leşkeriyê bû û ji sivîlan re qedexebû. Akyon, îdia kir ku li vê herêmê gelek cenazeyên PKK'î û kesên sivîl jî di nav de li vê herêmê hatine defin kirin û birayê wî jî di nav de ye. Akyon, anî ziman ku dema ku li birayê xwe digeriya bûye şahidê bûyerêkî gelek cenaze bi leşên sewalan re hatine definkirin. Cenazeyên bi leşên sewalan re hatine definkirin kolandinên di çarçoveya dozên bûyerên kiryar nediyar de hatine kirin ên li Noqteya Lêgerîna Botaşê ya Silopiyê û gundê Basîskê ya Cizîrê hatine kirin hestiyên sewalan derketibûn.

### 6 kes çawa winda bûn?

Di 29'ê cotmeha 1995'an de welatiyên bi navê Abdurrahman Coşkun (18), Abdullah Olcay (21), Haznî Dogan (9) û birayê wî Seyhan Dogan (13), Mehmet Emîn Aslan (18), Nedîm Akyon (13), Davut Altunkaynak (12) û Suleyman Seyhan (58) hatibûn binçavkirin. Dayika Seyhan Dogan, Asiye Dogan, diyar kir ku piştî binçavkirinê çû tabura leşkeran û wiha gotibû "Leşkeran ji min re got 'Meraq neke, me zarokên te berdan diçin malê êdî tu caran nayên' Lê zarokên min nehat. Çend roj şûnde Haznî Dogan hate malê û tiştên di binçavan de bi serê wî de hatibû ji mere got. Li gorî Haznî 6 kesan îşkenceyên gelek giran ditin."

Di heman salê Asiye Dogan, têkildarî mijarê de bi riya telefonê tevlî nûçeyên Med TV'yê bibû gotibû "Ez ji dewletê dozdar im û zarokên xwe dixwazim" lê piştre ew jî windabû. Pişt re derket holê ku Dogan hatiye binçavkin û işkenceyekî gelek mezin ditîbû serbest hate berdan. Dogan ji ber işkenceya dît li Nexweşxaneya Cerrahpaşayê dihate dermankirin û piştre jî jiyana xwe ji dest da.

Ji kesên hatine binçavkirin cenazeyê Suleyman Seyhan (58), 5 meh şûnda di çalekê de şewitî hate dîtin. Şahidên bûyerê diyar kirin ku 7 kesên berî ku bên kuştin îşkence ditin û naylon helandin ser laşên wan. **(AMED / DÎHA)**

## 'Polîsan kurê min birîndar kir'

Derket holê ku Yaşar Ozdurak (28) ê li navçeya Qosera Mêrdînê piştî bûyera mirina yek jê polîs 3 kesan birîndar bû bi guleya polîsan hatiye birîndarkirin. Bavê Ozdurak, Şehmus Ozdurak got ku dema ku kurê wî bi bîsîklêtê dihat mala xwe bûye hedefa guleyên polîsan.

Li navçeya Qoserê li dijî Navenda Polîsan a Cumhuriyetê çalakiyek pêk hatibû. Di encama çalakiyê de 2 polîs û sivîlek birîndar bûbûn û polîsek piştre miribû. Piştî çalakiyê li nevçeyê operasyon hatibû destpêkirin û li taxa Ersoyluyê di avahiyeke de 2 kes hatibûn qetilkirin. Derket holê ku Yaşar Ozdurak bi guleya polîsan hatiye birîndarkirin. Ozdurak li Nexweşxaneya Zanîngeha Dîcleyê tê tedawîkirin. Bavê Ozdurak, Şehmus Ozdurak diyar kir ku dema ku êvarê kurê wî dihat malê piştî ku pira taxa Koçhîsarê derbas dibe ji panzêrê tê gulebarankirin û kurê wî ji çîpa xwe birîndar dibe, hestiyê çipa wî dişikê. Ozdurak wiha axivî: "Kurê min dema ku birîndar bû kete erdê. Lê panzer nesekinî û çû. Ji panzêrê gelek gule hatin avêtin lê tenê yek li kurê min ket. Piştî bûyerê polîsan 3 caran bi ser mala de girtin. Herî dawî jî bi kuçikan li malê lêgerîn kirin."

Serokê BDP'a Qoserê Seyfettîn Ateş jî got ku ji ber bûyerê gelê Qoserê mexdûr bûne û ji ber êrîşên polîsan li taxê hemû mal bûne hedefa guleyan. **MÊRDÎN**

## Dîsa aqûbeta windayan pirsîn

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û xizmên windayan vê hefteyê jî li Amed û Êlihê bi dirûşma "bila winda bên dîtin, kiryar bên darizandin" çalakî li dar xistin. Li Stenbolê jî Dayikên Şemiyê cara 265'emîn calakî li dar xistin.

Li Amedê endamên ÎHD'ê û xizmên windayan li ber Abîdeya Mafê Jiyanê ya Parka Koşuyoluyê cara 63'yemîn hatin ba hev. Di çalakiyê de rêveberê ÎHD'ê Racî Bîlîcî axivî û got ku ew wekî parazvanên mafên mirovan heta ku aqûbeta windayan bê aşekerakirin dê têkoşîna xwe bidomînin. Piştre jî endama ÎHD'ê Necîbe Guneş axivî û komkujiya ermenan a 1915'an de bibîranî. Guneş piştre jî aqûbeta Halîl Bîlgiç û Mehmet Bîlgiç ên ku di 17'ê mijdara 1996'an de li deriyê sînor ê Xabûrê hatin bincavkirin û windakirin pirsî.

Li Êlihê jî li kolana Gulîstanê çalakî hate lidarxistin. Hevserokên BDP'a Êlihê Saadet Becerîklî û Şehmus Aslan jî di nav de gelek kes beşdarî çalakiyê bûn. Beriya daxuyaniyê Serokê ÎHD'a Êlihê Osman Kunteş axivû û got ku têkoşîna dîtina windayan ne tenê ya ÎHD'ê ye û ev pêywira hemû kesên biwîjdan e. Kunteş banga bihistiyariyê kir. Piştre rêveberê ÎHD'a Êlihê Nîhat Ekîncî daxuyanî xwend û got ku ji bo ku tiştên ku berê hatine jiyîn careke din neyên jiyîn ew feraseta hevkariyê tînin ziman. Lê ji ber ku her diçe aloziya siyasî zêde dibe ev yek wan dixe fikaran. Piştî daxuyaniyê 5 deqîqe çalakiya rûniştinê hate lidarxistin.

### Aqûbeta ermenan pirsîn

Li Stenbolê jî Dayikên Şemiyê cara 265'emîn li ber Lîseya Galatasarayê hatin cem hev. Dayikên şemiyê di çalakiya vê hefteyê de aqûbeta 139 rewşenbîrên ermen ên di 24'ê Nîsana 1915'an de hatine windakirin pirsîn.

Daxuyaniya vê hefteyê ji aliyê rêvebera ÎHD'ê Leman Yurtsever ve hate xwendin. Yurtsever got ku beriya 95 salan Îttîhat û Terakiyê pêla girtinan daye destpêkirin û 220 ermen hatine binçavkirin. Ji wan 81 kes hatine qetilkirin û aqûbeta 139 kesan jî hêj nayê zanîn. Di daxuyaniyê de hate gotin ku civakake ku bi paşeroja xwe re rû bi rû neyê nikare demokrasiyê pêk bîne.

Li aliyê din komeke endamên ESP'a Stenbolê jî bi munasebeta salvegera komkujiya ermenan li cihê ku Hrant Dînk hatibû qetilkirin daxuyanî da û qurnefîl danî cihê ku Dînk hatibû qetilkirin. **AMED / ÊLIH / STENBOL**



## Girtiyan êrîş şermezar kir

Girtiyên siyasî yên di girtîgeha Ermenekê de êrîşa li dijî xebatkarê Azadiya Welat Alî Bîlen pêk hatiye bi şandina nameyekê şermezar kir. Girtiyên siyasî yên di girtgeha Ermenekê ya Karamanê de êrîşa li dijî xebatkarê Azadiya Welat yê Mêrsînê Alî Bîlen pêk hatî bi nameyên şandî şermezar kirin. Girtiyan, diyar kir ku êrîşên tên kirin êrîşên di salên 1990'an de pêk hatî tîne bira mirov û di nameyên xwe de wiha gotin: "Êrîşa li dijî hevalê me Alî Bîlen hatiye kirin em xemgîn kirin. Berê hevalê me Metîn, niha jî li dijî hevalê me Alî êrîş pêk hat. Ev êrîşên di salên 90'an de li dijî Apê kurdan Apê Musa û rojnamegerên din pêk hatin tîne bîra mirov. Li gel hemû zext, zordariyan û şahadetan Çapemeniya Azad nehate bêdengkirin û bila baş bizanin ku îro jî nikarin çapemeniya azada bêdeng bikin. Bila hêzên tarî baş bizanin ku heta Generalên Biçûk ên Apê Musa û gelê kurd hebe nikarin dengê Çapemeniya Azad bigirin. Em ji hemû xebatkarên çapemeniya azad re derbasbûyînê dixwazin û di xebatên wan de serkeftinê dixwazin." **MERSÎN**

## 2 sal û 4 meh ceza dan girtiyê kurd

Li rojhilatê Kurdistanê li bajarê Sine, Dadgeha Şoreşê ya Sine yê, 2 sal û 4 meh cezayê girtîgehê dan girtiyê kurd Muhemmed Qewamî. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin, cezayê 2 sal û 4 meh yê ku ji aliyê Dadgeha Şoreşê ya Sine yê ve ji Muhemmed Qewamî re hatî dayîn, di 4'emîn Dadgeha Însiyatîf ya Kurdistanê de jî hatiye pejirandin. Qewamî bi "yekparebûna welat avêtina metirsiyê" û bi peywendiya wî bi partiyek ya kurdan re, tê tawanbar kirin. **SINÊ**

www.arsivakurd.org

# 'Ev kurd in li wan bidin'

**Li Tirkiyeyê êrîş û lînca li dijî kurdan bê navber didome. Li Mêrsînê di navbera xebatkarên eczaneyê û polîsan de nîqaş derket û kurd rastî lêdanê hatin. Xebatkaran diyar kirin ku polîsan gotiye 'ev kurd in lê bidin'**

Xebatkarên Eczaneya Şîfa ya li hemberî Nexweşxaneya Welidandina Jinê û Zarokan a Navçeya Toroslarê îdia kirin ku ji aliyê polîsên ber nexweşxaneyê ve rastî lêdanê hatine. Xebatkarên eczaneyê diyar kirin ku di êrîşê de polîsan gotiye 'ev kurd in lê bidin' û li wan dane.

Xebatkarên Eczaneya Şîfa ya li hemberî Nexweşxaneya Welidandina Jinê û Zarokan a Navçeya Toroslarê îdia kirin ku rastî lêdana polîsên ber nexweşxaneyê hatine. Xebatkaran, anî ziman ku bêyî polîs sedemê nîşan bidin êrîşî wan kiriye û li wan dane. Hate îdiakirin ku xebatkarekî eczaneyê xwestiye bi xizmekî xwe yê nexweş re têkeve polîklînîkê û rayedarên nexweşxaneyê jî destûr nedaye vê yekê. Piştî niqaş di navbera rayedarê polîkilînîkê û xebatkarê eczaneyê de derketiye, hêzên ewlehiyê hatine cihê bûyerê û di navbera hêzên ewlehiyê û xebatkarên eczaneyê de pevçûn derketiye.



**Polîsan êrîş kir**

Hate angaştin ku piştî xebatkarê eczaneyê jî hatine cihê bûyerê polîsên li ber nexweşxaneyê bombeyê gazê avêtine eczaneyê û êrîşî xebatkarên eczaneyê kirine. Piştî bûyerê 4 xebatkarên eczaneyê hatin binçavkirin û piştî îfadeya wan hate girtin serbest hatin berdan.

Xebatkarê Eczaneya Şîfa Alî Îhsan Bahar, serpêhatiyên xwe vegot û diyar kir ku dema xebatkarê eczaneyê xizmê xwe dibir bijîşk rayedarên girtîgehê gotiye 'personelên eczaneyê nikarin têkevin polîklînîkê' xebatkarê wan negirtine hundir û wiha got: "Piştî me bûyer bihîst em çûn nexweşxaneyê. Lê hemû hêzên ewlehiyê yên nexweşxaneyê êrîşî me kirin.Piştre polîs hatin. Polîsan jî li me dan. Gaza Îsotê bikar anîn. Di nava gelek nexweşan de li me dan."

Bahar, destnîşan kir ku li şûna polîs navbertiyê bike li wan dan û wiha dom kir: "Rayedarên nexweşxaneyê û polîsan êrîşî me kir. Polîsan got 'Ev kurd in, li wan bidin.' Gaza îsotê avêtin ser me. Ez ne kurd im. Ez ji Erdemliyê me û yoruk im. Polîsek ket eczaneyê û gef li me xwar. Pişti bûyerê ez li 155'an geriyam û bi komser re axivîm. Ji min re got were qereqolê. Li ser vê yekê ez Qereqola Polîsan a Guneykent a Toroslarê. Min li wir bi amîrekî re hevdîtin çêkir. Dema min mijar vegot ez avêtim derve. Bi polîsên din re aciz bû û got 'Çima hûn viya digirin hundir?' Dîsa polîs hatin eczaneyê û gef li me xwarin." **MÊRSÎN**

## Protestoya Redkarê wijdanî

Redkarê wijdanî Enwer Aydemîrê ku, bi tawanbariya `dij fermanan derketiye` li Girtîgeha Leşkerî ya Eskîşehîrê tê girtin, biryar da ku tevlî runiştinan nebe. Enwer Aydemîrê, ji girtîgehê hatibû berdan, lê ew biribûn leşkeriye. Aydemîr leşkerî bi wijdanî red kiribû. Ew niha dîsa li Girtîgeha Leşkerî ya Eskîşehîrê girtiye. Rûniştina wî ya dawî bo roja 2`ê hezîranê hatibû paşxistin. Lê wî biryar daye ku, ew dê tevlî rûniştinan nebe. Parêzerê wî Davut Erkan diyar kir ku, Aydemîrê ku tevlî rûniştina dawî nebuye, wê ji îro pêde jî tevlî runîştinan nebe. **ESKÎŞEHÎR**

## 'Bila faîlên tacîzê bên cezakirin'

Meclîsa Jinê ya BDP'a Îzmîrê, xwest ku kiryarên tacîzkirina Endama Meclîsa Jinê ya BDP'a Amedê û bûyera tecawizê ya li Sêrtê bên cezakirin. Li Îzmîrê, Meclîsa Jinê ya BDP'ê, li avahiya rêxistinê têkildarî tacîzkirina Endama Meclîsa Jinê ya BDP'ê ya Amedê û bûyera tecawizê ya li Sêrtê daxuyaniyek da çapemeniyê. Dayîkên Aştiyê, ÎHD, ÇHD, ESP, EKD, BKÎ û SFK jî piştgirî dan meclîsa jinan. Seroka BDP'a Navçeya Konakê Parêzer Canan Uçar, daxuyanî xwend û di axaftina xwe de polîtîkayên AKP'ê rexne kir. Uçar, da zanîn ku bi van êriş, tacîz û tecawizan rê li ber têkoşîna jinên kurd bigirin û der birî ku li hemberî vê jî tevgara jinê ya kurd ji kampanayayek daye destpêkirin. Uçar, di dawiya axaftina xwe de xwest ku kiryarên tacîzkirina Endama Meclîsa Jinê ya BDP'a Amedê û bûyera tecawizê a li Sêrtê bên cezakirin. **ÎZMÎR**

## ÎHD'a Rihayê kongreya xwe pêk anî

ÎHD'a Rihayê 11'êmîn Konreya xwe a asayî pêk anî. Serokê Egîtîm Senê ya Rihayê Sitki Dehşet, di kongreyê de axivî û diyar kir ku pirsgirêka efûkirina zarokan tune, pirsgirêka rê û rêbazên dibin sedema zarok tevli çalakiyan bibin heye.

11'emîn Konreya Asayî ya ÎHD'a Rihayê bi tevlibûn gelek kesan li Navenda Çandê ya Şaredariya Rihayê pêk hat. Serokê BDP'a Rihayê Îbrahîm Ayhan, Nûnerê Herêmê yê ÎHD'ê Alî Akinci, Serokê Baroya Rihayê Yayha Demîrkol, Serokê Şaxa MAZLUMDER'ê Meral Dervîşoglu, nunerên sendîqayan KESK'ê û parazvanên mafê mirovan amade bûn. Li salonê pankartên "Bila winda bên dîtin, berpisyar bên darizandin". "Bila êdî dayik negirîn" hatin daliqandin. Serokê BDP'ê Îbrahîm Ayhan, di kongereyê de axaftinek kir û li ser niqaşên guhertina maqeqanûnê sekinî. Piştî Ayhan, Serokê Şaxa Egîtîm Senê Sitki Dehşet jî nêrînên xwe anî ziman û got: "Pirsgirêka efûkirina zarokên tune. Pirsgireka zagon û rêbazên ku dibin sedama zarok beşdari çalakiyan bibin heye. Divê ev zagon bên guhertin.

Pîştî xwendina raporên malî û faaliyetê dest bi hilbijartinan hate kirin. Di encama hilbijartinan de Cemal Babaoglu, Ruken Şahîn, Naîl Çetîn, Muslum Kina, Nadîle Şaşkin, Cengîz Erîş û Huseyîn Karakeçîlî ji bo rêveberiya Şaxa ÎHD'a Rihayê re hatin, hilbijartin. **RIHA**

## Banga diyalog û çareseriyê hate kirin

Komelaya welatiyê Azad a li Taxa Yenimahaleyê bi beşdarbuna sedan kesan hate vekirin. Di vekirina komeleyê de hate xwestin ku operasyon bi dawî bibin.

Komelaya Gelê Azad a Taxa Yenimahaleyê bi beşdarbûna sedan kesan bi merasimekê hate vekirin. Di merasima vekirina komeleyê de Parlamenterê BDP'a Wanê Ozdal Uçer, Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, Şaredarê Artamêtê Abdulkerîm Sayan, Şaredara Sixkeyê Nezahat Erguneş, Alîkarê Serokê BDP'a Bajêr Nurettîn Turgut, Rêxistinên Civakî yên Sivîl, Dayikên Aştiyê jî amade bûn.

Di vekirina komeleyê de jinan bi cilên gelerî xwe xemilandin û govend hatin girêdan. Di vekirina komeleyê de Alîkarê Serokê BDP'a Bajar Nurettîn Turgut axaftinek kir û xewst xwîn raweste. Turgut, diyar kir ku ew wekî kesekî qazidê aştiyê bang dike ku bila operasyon bên rawestandin û xwîna ku diheriki bê sekinandin û wiha axivî: "Muhatabên vê pirsgirêkê hene, divê bi wan re bê runiştin û diyalogê pêk bînin. Divê xwînê rawestinin." Piştî axaftina Turgut Şaredarê Wanê Bekîr Kaya jî axaftinek kir û diyar kir ku felsefeya welatiyên azad ku di sala 2004'an de ji hêla Rêberê PKK Abdullah Ocalan derxist holê hê nehatiye fêm kirin. Kaya wiha got: "Felsefeya welatiyên azad divê baş bê fêmkirin. Ev felsefe ji bo pêşxistina çanda demokrasiyê gelek girîng e lê desthiladar û dewlet dixwazin vê felsefeyê vala derbixin û li ser navê operasyonên KCK'ê bertaraf bike. Siyasetmedarên kurd bi hinceta endamên KCK'ê ne têne girtin û ceza dixwin."



Piştî Kaya, Parlamenterê BDP'a Wanê Ozdal Uçer axivî û got ku zarok, jin û ciwanên kurdan tên binçavkirin û girtin. Uçer wiha axivî: " armanca avakirina van komelayan pêşxistan azadî û demokrasiyê ye. Lê dewlet û hikûmet van saziyan kurdan terorîze dikin. Lê ew bixwe zarok, jin û ciwanên kurdan digire û terorîstiyê dike" Piştî axaftinan Komeleya Gelê Azad a Taxa Yenimahaleyê hate vekirin. **WAN**

## Asîmîlekaran îcar jî destavêt Licê!

Terîqeta Fethullah Gulen vê carê jî dest avêt navçeya Lîcê ya ku, cihek xwe yê girîng di têkoşîna azadiya kurdan de heye. Terîqeta Gulen, dibin navê holên xwendinê yên EHÎDER`ê li navçeyê dest bi rêxistina xwe kiriye û di navçeyê de lez daye xebatên vekirina malek ya xwendevanan.

Ne Hemîdiyan karî di destpêka sed salê de bikevinê, nejî Hîzbul-Kontra û cerdevaniya ya salên 1990`an. Lê niha Terîqeta Fethullah Gulen dibin navê rêxistina `olî` û `destek dayîna perwerdê` ya ji bo xwendekaran, dixwaze bikeve navçeya Lîcê ya Amedê. Destavêtina Lîcê ya Terîqeta Gulen ya weke ocaxên Asîmîlasyonê jî tên binav kirin balkêşe.

**Qeymeqamtî piştgiriyê dide**

Terîqeta Gulen ya dibin navê olî de mîsyonertî yê dike, jibo ku zarokên Lîcê bigire ocaxên asîmîlasyonê, bi qeymeqamtiyê re tevdigere. Qeymeqamtiyê bi rêkirina xwendekaran ya ji bo `Dersxaneya Surê` ya li navçeya Erxenî ya Amedê destek dayî terîqetê, ji aliyêdin ve jî hinek mamostayên ku girêdayî rêveberiya Perwerdeya Neteweyî ya Lîcê û hinek mele yên ku girêdayî diyanetê ne bi awayek rêkûpêk bi hevre xebatê dikin.

Terîqeta Gulen dibin navê holên xwendinê yên EHÎDER`ê, xebatên xwe li navçeya Lîcê dimeşîne, di çarçoveya xebatên xwede, li nêzîkî Lîcê û dibistana seretayî ya.

Demîrçelik dest bi vekirina mala xwendekaran kir. Balkêşe ku, cihên xebatê yên Terîqetê li nêzîk dibistanan hatine vekirin. Nîştecihên Lîce yê, ji karên terîqetê yên li navçeyê bi fikarin.

Hikûmeta AKP`ê di sala 2009`an de kesek girêdayî Terîqeta Gulen tayinî Rêveberiya Perwerdeya Neteweyî ya Navçeya Lîcê kiribû. Tê diyarkirin ku, Egîtim Bîrsen, Saglik Bîrsen û hinek meleyên girêdayî Sendîkaya Wexfa Diyanetê jî, di nava rêxistinkirina terîqetê ya Lîcê de kar dikin. **AMED**

## Mêrsînî li dijî nukleerê meşiyan

Bi sedan endam û nûnerên Platforma Dijberiya Nukleerê ya Mêrsînê û saziyên sivîl, li ber Taşbînayê li hev kom bûn û heta avahiya AKP'ê ya Mêrsînê meşiyan. Di meşê de endam û nûnerên BDP, KESK, Odeya Tabîban a Mêrsînê, Komeleya Romanên Akdenîzê TOK, Dev-Lîs, Dev-Genç endamên Meclisa Şaredariya Akdenîzê jî di nav de bi sedan kes amade bûn. Girseyê pankartên "Berhemên Nukleerê zirarê dide tenduristiyê", "Nukleer dikuje, hûn jî li hember derkevin", vekirin û bi dirûşmeyên heta AKP'ê meşiyan. Li ser navê platformê Sebahat Aslan, diyar kir ku herî zêde enerjiya nukleerê zirarê dide jiyanê û derdorê û xwest projeyên têkildarî nukleerê bi dawî bibin. **MÊRSÎN**

## Rojnameyên Vakît û Zaman derewan dikin

Rojnameyên Vakît û Zamanê derewê salên dawî yê herî mezin kirin. Her du rojnameyan cih da nûçeya rojnameger Fuat Dogansoy li Fînlandiyayê hatiye binçavkirin. Lê derket holê ku Dogansoy par ji Stockholmê daxwaziya îltîcayê kiribû. Ji ber ku pasaport negirtiye hê jî nikare derkeve devreyî Stockholmê. Dogansoyê ku derneketibe derveyî Stockholmê çawa li Fînlandiyayê tê binçavkirin û derket holê nûçeyan her du rojnameyan jî derew in.

Rojnameyên Vakît û Zamanê îdiakiribûn ku nûçe li gorî daxuyaniya Fînlandiyayê çêkirine lê daxuyaniya Fînlandiyê bi vî rengî nîn e. Her wiha di meheke dawî de li Fînlandiyê tu kurdek nehatiye binçavkirin. Dogansoy niha li Stockholmê ye û rojnameger bixwazin dikarin bi rihetî bigihêjinê! Taybet jî rojnameya Zamanê di nûçeya xwe de Fuat Dogansoy wekî hedef nîşan dabû û Dogansoy diyar kir ku dê bi riya parêzerên xwe giliyê her du rojnameyan bike. **STOCKHOLM**

www.arsivakurdi.org

# Tevkujiyê dikin mijara bazarê

**Roja 24'ê Nîsanê wek roja tevkujiya ermeniyan dertê pêş. Lê bazarên polîtîk ên Tirkiye, Ermenistan, Azerbaycan û Amerîkayê nahêle mijarên wisa hesas li gor nirxên hiqûqa navneteweyî û mafên mirovan bê nirxandin**

NAVENDA NUÇEYAN / AMED



Nakokiya di nav Azerbaycan û Ermenistanê de û bazara polîtîk a navneteweyî de tevkujiya ermeniyan jî tê îstîsmarkirin. Ev mînak mijarê vedibêje: Serokomare Azerbaycanê Îlham Aliyev piştî civîna şêwrê ya Wezareta Parastina Azerbaycanê daxuyanî da televîzyonan. Di daxuyaniyê de bal kişand ser girîngiya xurtkirina artêşa Azerbaycanê û got: "Ev ji bo me meseleyeke pir girîng e".

Aliyev bi sifata serfermandariya giştî beşdarî civîna Wezareta bû û di civînê de li ser rapora Wezîrê Parastinê yê Azerbaycanê Sefer Abiyev amade kiribû hûr bû.

Aliyev bal kişand ser peymanên Madrîdê yên hatî nûkirin û wiha pêde çû: "Axa hevgirtî ya Azerbaycanê bi tu awayî nabe mijara diyalog û nîqaşan." Aliyev vedibêji ku Ermenistan bi hewldanên cihêregn pêşî li çareseriyê digire û dixwaze dagirkeriya li ser erdê Azerbaycanê mayînde bike.

Aliyev destnîşan dike ku dema şerê Ermenistan û Azerbaycanê de alîgirên Ermenistanê bi helwesteke dijwar dijberiya Azerbaycanê kirine. Ji bo vê jî got 'tevkujiya hocaliyê' mînaka şênber e. Aliyev vedibêje ku Ermenistan guh nade 4 biryarên Neteweyên Yekbûyî û bi piratîka xwe wan binpê dike.

Aliyev piştî hevkariya Tirkiye û Ermenistanê bertekên xwe yên li dij Tirkiyeyê jî venaşêre. Piştî têkiliyên Tirkiye û Ermenistanê pêş ketin û protokol di nav her du aliyan de hatin mohrkirin Bakuyê bertek nîşan da. Ala Tirkiyeyê ya li ser hin gorên tirkan yên li Azerbaycanê daxist û eyareke nû da têkiliyên bi Tirkiyeyê re û polîtîka xwe ya Tirkiye û Amerîkayê rewestand.

Azerbaycan bi polîtîka dawî Tirkiye û hikûmeta AKP'ê jî bi îxanetê sûcdar dike û dibêje 'ka 2 dewlet û miletek.' Erdogan gotibû Tirkiye û Azerbaycan wek '2 dewlet û miletek e'

Azerbaycan piştî hilweşîna Sovyetê bi ser Tirkiyeyê re demeke dirêj ket nav barometreya polîtîkayên Amerîka û Ewropayê. Pirojeya xeta lûleyê ya neftê a Bakû-Ceyhan pêngava şênber ya vê polîtîkayê bû.

Lê piştî îxaneta Tirkiyeyê û pêşveçûna têkiliyên Tirkiye û Ermenisatê Aliyev qibleya polîtîka Azerbaycanê ya navneteweyî ji nû ve guhert. Berê xwe da Moskovayê.

Niha Amerîka jî, Tirkiye jî ji ber vê ketine nav panîkê. Dixwazin dilê Bakuyê xweş bikin. Ji bo vê jî protokolên nav Tirkiye û Ermenistanê roja 10'ê cotmeha par li Zurihê hatibûn mohrkirin hat rawestandin.

Heke Azerbaycan biryardar tevbigere û hevkariya bi Moskovayê re derxe asta stratejîk dê polîtîka Amerîka û Ewropayê ya li ser Qafqasyayê îflas bike.

Azerbaycan wek 'serê kaniyê' ya Qafqasyayê ye. Berdewama polîtîkayek wisa pêşî li projaya Nabokayê ya jî digire. Bi kêmanî dê şaxa projeya Nabokayê ya ji Qafqasyayê tê û biçe Ewropayê ji nihave bi pêşketina hevkariya Ernenistan û Tirkiyeyê di bin rîska mezin deye.

Obama di bin van hesaban de îsal jî nego 'tevkujiya ermeniyan' û di nav bêdengiyê de pişt dide da tevkujiya Tirkiyeyê ya li ser kurdan tê meşandin.

## Li Tirkiyeyê tevkujî didome

Ermeniyên li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê dijîn bo ku tevkujiya ermeniyan ya 24'ê nîsana 1915'an li ber Qesra Spî xwepêşandana protestoyî li dar xistin. Xwepeşandêran zext û zorên li ser kurdan mînak nîşan dan û gotin: "Hêjî li Tirkiyeyê tevkujî didome û tevkujiya li dijî kurdan ji bo vê mînaka şênber e."

Di xwepêşandane de bang li serokwezîrê DYA'yê Barack Obama kirin û jê xwestin tevkujiya ermeniyan ya sala 1915'an wek tevkujî qebûl bike. Obama duh li ser tevkujiyê axivî. Lê wek ku dihat payîn Obama peyva tevkujiyê bikar neanî.

Xwepêşandêran Tirkiyeyê bi înkarkirina dîrokê sûcdar kirin û vê bangê kirin: "bê bi dîroka xwe re rû bi rû be."

Xwepeşandêran bo ku bal bikişînin ser xwe rêbazên balkêş bikar anîn, devê abîdeya azadiyê bi ala tirk girêdan û meşiyan.

Bi daxuyaniyan diyar kirin ku Tirkiyeyê ji mêj ve xwedî hişmendiya tevkujiyê ye û ev hê jî didome û wiha hat gotin: "Li dij nifuza kurdan bê navber polîtîka tevkujiyê desthilatdare û didome. "Hat aşkerakirin ku Tirkiye zirara herî mezin dide mîrateya çandî ya gelan.

Kelekî ermen li ser kursiya bi tekerlek ku zarokên ew anîn xwepêşandanê pirtir bal kişand. Kalê ermen pangakrta ku li ser "Ataturk damezrînerê tevkujiya Hitler e" nivîsandî berz kir. WASHINGTON

## NATO dê îsal vedikişe

Di civîna paytexta Estonya Talinê bo destguhertina desthilatdariya rêveberiya Afganistanê û vekişîja leşkerên NATO'yê ya ji Afganistanê dîrok hat diyarkirin.

Li Afganistanê di bin fermandariya NATO'yê de ji 40 welatan 80 hezar leşkerên biyanî hene.

Di civînê de baryar hat girtin ku vekişîn di nav vê salê de dest pê bike. Amerikayê jî aşkera kir ku ji serê tîrmeha 2011'an û şûn ve dest bi vekişîna ji Afganistanê dike. Washington berya ku dest bi vekişînê bike lez da ku desthilatdariya Aganistanê ya ewlehî û artêşê dewrê polîs û artêşa Afganistanê bike.

Di civînê de, li ser mijarê Sekreterê Giştî yê NATO'yê Anders Fogh Rasmussen axifî. Di axaftinê de got ku pêwîstî heye NATO lez bide perwerdeya polîs û artêşa Aganistanê. Ji bo vê jî destnîşan kir ku pêwîstî bi 450 peywirdarên perwerdeyê heye.

Rasmussen di roja duyemî ya dawî de axivî û li ser çekên nukleerî jî rawestiya. Rasmussen xwest ku NATO hêza xwe ya nukleerî heta ku li cîhanê di destê welateke din de çeka nukleerî hebe biparêze. Hin welatên Ewropa ku Almanya jî di nav de dixwest Amerîka bê ku angajeyê hêzeke din bibe çekên nukleerî yên li Ewropayê kêm bike.

Berya Rasmussen Wezîra Karên Devre ya Amerîkayê Hilary Clintonê jî destnîşan kiribû ku Amerîka çekên nukleerî bi yekalî kêm nake. Bo ku Amerîka çekên nukleerî kêm bike xwes bi muxatabên nukleerê yên wek Rûsyayê re lihev bike. Di çarçoveya du alî de çekên nukleerî dê kêm bike. Ev jî hîsiyata di asoyê nêz de ne pêkane çekên nukleerî bên kêmkirin derxist pêş. TALLÎN

## Yewnanîstan li ber îflasê ye

Hikûmeta Atînayê bo ku pêwîstiyên lezgîn bibersivîne xwest paketa hatî pêşniyarkirin bikeve meriyetê. Serokwezîrê Yewnanîstanê Yorgo Papandreu fermî serî li YE û IMF'yê da bo ku paketa krêdiya 60 milyar dolarî bidinê.

Serokwezîr da zanîn ku girtina paketa krêdiyê ji bo sererastkirina aboriya Yewnanîstanê gaveke jêneger e.

Bang jî destnîşan dike ku butçeya Yewnanîstanê ji rêjeya ku tê texmîn kirin jî kambaxtir e. Li gor hejmarê dawî deynê Yewnanîstanê yê der bi qasî ji sedî 13,6'ê dahatuya mîlî ya Yewnanîstanê ye. Piştî aşkerakirina hejmarên nû saziya krêdiyê ya Moodyê dereceya krêdiya Yewnanîstanê ji A3'yan daxist A2'yan. Ji ber derceya kêm ya krêdiyê Yewnanîstanê ancax dikare krêdiya ji sedî 8 bikar bîne. Yekîtiya Ewropa û IMF'yê paketa mijarê ya 60 milya dolarî pêk tê ji sedê 5 faîzê dide Atînayê. ATÎNA


LARA

Werin LARAyê cudahiyê bibînin

LARA navnîşana erzaniyê!
Cil û xemla malê
Cilên folklorîk
Cureyên cilên kurdewar
Û ji bo dawetan rûyên mase û sandalyeyan

Nîşe: Her wiha hemû cureyên cilan bi erzanî bi kirê tê dayîn

Navnîşan: Cengîzler Cad No:14 Baglar - Amed
Tlf: 0 (412) 233 30 13 Gsm: 0 (539) 270 38 97





Bûrhan Erdem
burhanerdem@hotmail.com


## Dîasporaya ermeniyan nexapiya

Komkujiya ermeniyan wekî yekemîn qetlîama ji sedsala bîstan mayî, beriya 95 salan pêk hatibû. Lê tevî ewqas salên di ser re çûyî, vî sûcê mirovahiyê hînê jî di nav dîplomasiya nava dewletan de dibe mijara bazariyan. Sedema vê yekê jî ew e ku hê jî rêveberiya Tirkiyeyê, vê komkujiyê înkar dike. Lê bi saya têkoşîna ermeniyên ji tevkujiyê rizgar bûne ku îro neviyên wan kal û pêrên xwe dişopînin û dor li komara Tirkiyeyê teng kirine.

Mînaka herî mezin a karûbarên Tirkiyeyê asteng dike yên dîasporaya ermeniyan li Fransayê ye. Li Fransayê nifûsa ermeniyan bi qasî nîv milyon mirovî ye ku bi vê yekê jî bûye welatê herî pir ermenî lê dijîn ê Ewropayê. Fransa yek ji wan welatan e ku lobî û aktîvîteyên dîasporaya ermeniyan lê çalak e. Di encama vê çalakbûnê de jî, qirkirina ermeniyan a sala 1915'an, gelek caran dikeve rojeva çapemenî û siyaseta Fransayê. Lobîya ermeniyan ev bi salan in xebatên xwe li Fransayê dimeşîne. Dew û doza wan ew e ku, welatên din nasbikin ku ew li Tirkiyeya niha hatine qirkirin.

Xebatên ermeniyan fêkiya xwe ya herî baş di 29'ê temûza sala 2001'an de bi destxistibû. Wê rojê parlamentoya Fransayê qetlîama ermeniyan naskiribû, lê bi vê jî nema û Fransayê ji bo înkara vê qetlîamê jî qanûnek derxist. Ji kesên vê komkujiyê înkar dikirin re ceza tê xwestin. Sedema ku ermenî ji bo cezakirina înkarara qetlîamê tevbigerin jî kampayayeke tirkên li Ewropayê bû. Li Berlînê çalakiyên bîranîna Talat Paşa hatibûn orgnîzekirin ku Talat Paşa berpirsê li pêş ê qirkirina ermeniyan e. Dîsa çalakiyên neteweperestan hebûn ku ermenî tehdît dikirin, herwiha pirtûkên qetlîama ermeniyan înkar dikin jî, bi hemû zimanên ewrûpî hatibûn çapkirin.

Ev xebata hanê jî di dema hikûmeta AKP`ê de, li ser navê xebatên tevlîbûna Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê, dihat kirin. Yanî bi gotineke din, di dîroka Tirkyeyê de, yên herî li dijî ermeniyan xebatên bi tesîr dan meşandin, AKP bûn. Dema ev dikir jî hikûmeta AKP`ê bahsa vebûna ermeniyan dikir. Çûn û hatina wan û ermeniyên Ermenîstanê zêdebûbû, heta li Brukselê gelek hêvî dihatin belavkirin ku ew ê Tirkiye komkujiyê nasbike. ermeniyên xwefiroş jî hebûn ku tevlî xebatên AKP`ê yên li Ewropayê dibûn. Li Parlamentoya Ewropayê, tirk û ermeniyên ji AKP`ê bawer konferansên çandî amadedikirin. Piştî qetla Hirant Dînk, Serokwezîr Erdogan soza peydakirina qatilên wî dabû, serokkmar Abdullah Gul çûbû, li Êrîvanê li maça millî temaşekiribû û hwd.

Yên bi siyaseta AKP`ê nexapiyan û zexta AKP`ê herî hîskirin, dîasporaya li Ewropayê bû. Fransa di serî de, tevî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, gelek dewletên mezin di karûbarên xwe yên bi Tirkiyeyê re de naskirina qirkirinê derdixin pêş. Di berdêla wê de jî, berjewendiyên aborî û siyasî bi dest dixin. ermenî ji vî alî ve jî ji rewşê haydar in û têkeliyên xwe yên bi parlamentoyan re, di ser hikûmetan re digrin. Vana îro li hemû welatên Ewropayê derketine çalakiyan û protestoya xwe ji cîhanê re radighînin. Daxwaza wan jî ew e ku dewletên mezin ên cîhanê vî sûcê mirovahiyê, nekin amûreke bazariyên qirêj.

# Dê bibin pira yekitiyê

**Parlamentera DEP'ê ya berê û yek ji amadekarên Konferansa Jinên Kurd Leyla Zana diyar kir ku îro "Cejna ronesansa jinên kurd e" û hêvî dikin ku ev bibe sedema konferanseke neteweyî**



## Îro jî konferans didome




Konferansa Jinên Kurd ê li Amedê tê lidarxistin ji pênc beşan pêk tê. Di her beşê de axaftina pênc axêveran hate plankirin. Di konferansê de bi giştî pirsgirêkên kurdan û bi taybetî jî yên jinan çi ne, dê bên nîqaşkirin.

Ji înkar û redkirina nasnameyê bigirin heta gelek şiklên şîdetê, yên wekî recm, sunetkirina jinan, kuştin û qetilkirina jinan ên li ser navê namûsê, şîdeta li malê, berdêl, zewaca bi darê zorê, şîdeta cinsî ya ku ji hêla dewletê ve pêk tê, tacîz û tecawiz û qedexekirina zimanê zikmakî û hwd. û şiklên cudahiyên piralî û rêbazên têkoşînê yên bi wan pirsgirêkan re tên nîqaşkirin.

**Perspektîfa jina kurd**

Yek jî tenê nîqaşên li ser pirsgirêkan na, perspektîfên jinên kurd ên ji bo çareseriyê û rêbazên wan ên têkoşînê jî dê bên kifşkirin. Wekî din ligel cudahiyên civakî û erdnîgariya ku jinên kurd lê dijîn, wate û girîngiya piştgiriya neteweyî ya demokratîk çi ye, di konferansê de tê parvekirin.

Bi salan in ji hêz û partiyên siyasî yên kurdan daxwaziya konferanseke neteweyî tê kirin. Lê tu encamek derneket holê. Jinên ku tevlî konferansê bûn hemfikrin ku ji bo yekitiya kurdan ev konferansa bibe gaveke destpêkê û rê li pêşiya gelek pêşveçûnan. Jinan bi gihiştina hev dê bibin pireke yekitiyê.

**Dê pêşengiyê bikin**

Bi vê konferansê derket holê ku ev qas jinên kurd ên çalak li her derê cîhanê belav bûne û hemû jî di qadên kar û barên xwe de serkeftî ne. Jinên ku tevlî konferansê bûn, da zanîn ku piştî şerên birakujiyê yên ku bi salan di navbera hêzên kurdan de qewimîn, dil û mêjiyê gelê kurd pir êşandin.

Jinan bi wê konferansa jinên kurd armanc dikin ku di destpêkê de di nav xwe de bingeha yekitiya xwe daynin û paşê jî ji bo jinên Rojhilata Navîn pêşengiyê bikin.



## Bi kulîlkan pêşwazî kirin

40 jinên ku ji başûr tevlî konferansê bibin ji hêla parlamenter û şaredarên BDP'ê ve hatin pêşvazîkirin. Jinan bi kulîlkan mêvanan pêşvazî kir. Şevîrmenda hiqûqî ya Berham Salîh Amîra Hasan, parlamentera Kurdistana Federal Ala Talabanî, Emîna Zîkrîn, parlamentera Partiya Goranan Peyman Ezadin, endama Komelaya Jinan a Asuda ya li dijî şîdetê Pervîn Azîz, ji partiya Komînîst a Îranê Sabriye Bahmani, nivîskar Şîrîn Amedî û gelek nivîskar, akademîsyên û rojnameger bi tevahî 40 kes ji bo konferansê hatin.



## Amed mala hemû jinên kurd e

Di çarçoveya Konferansa Jinên Kurd li Amedê kokteylek li salona Pêşengehê ya Navenda Çanda Cegerxwîn hat lidarxistin. Endamên DOKH'ê, Parlamentera DEP'ê ya berê Leyla Zana, Hevseroka KCD'ê Yuksel Genç, ji Almanyayê keça Qazî Muhammed Suheyla Qazî, ji Amerîkayê Prof. Dr. Kajal Rahmanî, parlamenter, akademîsyên û gelek beşdarvanên ji başûr, rojhelat, rojava, Amerika û Ewropayê hatibûn beşdarî kokteylê bûn.

Di kokteylê de pêşengeha wênesaz Nevîn Gonger Reşan a bi navê, "Azadiya min di nasnameya min de veşartiye" hate pêşandin. Di pêşengehê de wêneyên jinên têkoşêr ên kurd ên wekî Zekiye Alkan, Leyla Kasim, Leyla Bedirxan, Meryem Xan, Ayşe Şan, Rewşên Bedirxan û gelekî jinên navdar ên din hatin pêşandan. Ji amadekarên Konferansa Jinên Kurd, Leyla Zana axaftinek kir. Zana, xêr hatina delegeyan kir û got ku ew îro malovaniyê nake û got: "Amed mala hemû jinên kurd e. Em niha bi hev re li ser axa xwe ne." Zana, ji bo amadekariyên DOKH'ê jî spasiyên xwe kir û da zanîn ku jin bi salan e têkoşîna azadiyê didin û timî kolanan li ser piyan in û wiha axivi: "Jinên kurd li rojhilata navîn bûne stêrk. Û li cîhanê mînak. Ez ji ber vê asta jinên kurd gihîştinê jî gelekî bextewar im." Zana, têkildarî amadekariyên hunerî jî destnîşan kir ku huner carna di wêneyekî, carna di çavekî û di şeklekî de dibe xwedî karekter.

Li Amedê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) û Leyla Zanayê, Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd a bi navê "Di Pêşvebirina Demokrasiyê De Rista Jinan" hate lidarxistin. Konferans bi beşdariya 150 delegeyan li salona Resepsiyonê ya Parka Sumerê pêk hat.

Ji parçeyên cuda cura yên kurd lê dijîn nûnerên jinan tevlî konfernasê bûn. Ji Amerîka, Ewropayê bigire heya Iraq, Îran û ji Sûriyeyê jinên siyasetmedar, akademîsyen, nivîskar, hunermend û nûnerên saziyên jinan tevlî konferansê bûn. Endamên DOKH'ê, Hevseroka BDP'ê Gulten Kişanak, hemû parlamenterên BDP'î yên jin, şaredarên BDP'î yên navçe û bajaran û bajaran, Hevseroka KCD'ê Yuksel Genç, ji parêzerên Buroya Hiqûqê ya Asrinê Hatîce Korkut, endamên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, Parlamentera Partiya Yekîtiyê ya Kerkukê Ala Talabanî, keça Qazî Mihemmed Suheyla Qazî, Prof. Kajal Rahramanî, Parlamentera Koma Goranê Peyman Ezadîn, Parlamentera KDP'ê Emîne Zikrî, ji HAKPAR'ê Hamiyet Çelebî, ji endamên Koma Aştiyê Gulbahar Çîçekçî, Endama Koma Aştiyê ya berê Aysel Dogan, Parlamentera Ewropayê ya berê Feleknas Uca û gelekî nûnerên sazî û rêxistinên jinan ên kurd beşdarî konferansê bûn.

**Gaveke dîrokiye**

Endama Tevgera Jinan a Azad û Demokratîk Mulkiye Bîrtane, axaftina vekirinê kir û diyar kir ku ev konferans ji bo jinan gavek dîrokî ye. Birtane, destnîşan kir ku wekî tevgera jinan heta niha gelekî xebat meşandine lê ev gav dê bibe gavek dîrokî ji bo jinên kurd û yên cîhanê. Birtane, anî ziman ku jin li hemberî perlalê bi salan in têdikoşin û wiha got: "Jinên kurd di nava civaka feodal de bûne xwedî asta nûnertiyek girîng. Jin di gelekî qadên wekî rêveberiyê de êdî xwedî nûnertiyeyê ye." Bîrtane, anî ziman ku jin ji bo azadiya zayendî û civakek demokratîk têdikoşe û wiha axivî: "Pirsgirêka jinan a pirsgirêka azadiyê ye. Ji ber vê yekê jî em ji bo azadiyê li hemberî polîtîkayên bijaftinê têdikoşin. " Bîrtane, da zanîn ku pirsgirêkên jinan hevpar in û divê jin dêngên xwe bigîhin hevdû yê têkoşînek hevpar bimeşînin.

**Yekîtiya neteweyî hewce ye**

Parlamentera DEP'ê ya berê Leyla Zana di axaftina xwe de got ku hun bi xêr hatin mala xwe Amedê. Zana destnîşan kir ku barê jinên kurd gelekî giran e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ev bar barê pêkutî, neqebûlkirin, barê li hevkirina Qesr- i Şîrîn û Lozanê ye. Ev bar barê koçberî û bêwariyê ye. Pirsgirêkên jinan yên siyasî, civakî, çandî, olî û aboriyê hene û ji bo civakek azad divê em ji îro bêhtir têbikoşin. Ji bo têkoşînek bihêz, yekîtiya neteweyî divê. Ji bo rêbazên hatine yekîtiya neteweyî jî em dê nîqaş bikin. Li hemberî recm, sineta jinan, qetilkirin, pir zewac, zewaca bi zorê û li hemberî tacîz û tecawîzê dê têkoşînek rojekê na ya demdirêj divê. Lazim e jinên kurd pir alî têbikoşin. Ji ber ku jinên kurd him têkoşîna nasnamê û him jî ya zayendî têdikoşin."

**Cejna ronesansa jinên kurd**

Zana, destîşan kir ku îro "Cejna ronesansa jinên kurd e" û hêvî dike ku ev gihîştin bibe sedema konferansek neteweyî. Zana, rexneya "Hîna kurdan yekîtiya xwe avanekiriye" kir û ev tişt gotin: "Ez bi vê mebestê bang li hemû kurdan dikim. Divê kurd di serî de aştiyekê û têkiliyek zelal avabikin. Heta gelê kurd yekîtiya xwe ava neke dê nikaribe bibe xwedî hêz û vînekê. Zana, got ku hemû hêzên li cîhanê hewl didin kurdan li gorî berjewendiyên xwe bi kar bînin û wiha axivî: Ez hêvî dikim ku êdî jinên kurd destûra rijandina xwîna birayan dê nedin. Ji bo hatina jinên Iraq û cihên dinê astengî nehatin derxistin sipasiyên xwe ji rayedaran kir û da zanîn ku jin têkoşîna jinan dê bingeha aştiyek mayînde dê avabike û serkeftin ji bo hemû jinan xwest. **AMED**



**Mizgîn Ronak**

## Geryan

Carna ferhengan vedikim û li 'tiştek' digerim, tiştek ku ez nizanim çi ye? An jî li gotinek ku ez nizanim dê çawa be. Dixwazim dema ku rûpelên nazik û nazenîn bi ser hev de wergerînim, tiştek an jî gotinek wisa xweş derkeve pêşiya min ku tevî lêgerînên min bigihîjin bersivên xwe.

Dixwazim ku ew tişt/ gotin, tevî rûyên hezkiriyên min bi xwe re bîne, an jî tevî wateyên ku ez li hêviya wan im. Ji xwe re dibêjim; vê carê, dê vê carê, derkeve pêşiya min. Ji nişka ve bibê ez hatim, wek ferhengek leyîstika zaroktiyê, wek periyek baharê, an jî hîva ku xwe bi çi kul û halekî ji bin ewran rizgar kiribe, geş û ronak! Dixwazim wisa jiyanwar û dilşad be ku tu jan û xem, tu tarî û zordarî, tu bindestî û birîn nêzîkê wê nebûbe.

Lê geryanên min nagihiyê gotin/tişta ku lê digere, loma jî ez ji naçarî bala xwe didim ser peyvên ku derdikevin pêşiya min, mînak: gava din peyva jandar derket pêşiya min. Ji nû ve têgihîştim ku gelek xweş û newadar e. Gelo çima? Navê çi ye ku wiha delal û şêrîn e? navê janê! Jan çi ye? Raza jiyanê, bersiva jiyanê an jî bedêla jiyanê ye. Kurdan çima navek wiha xweş 'li vê bûyera' ku dide êşandin kirine? Dikare bi gelek bersivan bê bersivandin, lê ez ê tenê bêjim: ji ber ku kurd ji ber xwedîbûna çanda Neolîtîk, ji berê de xwedî farasetek felsefî bûne. Ma ku ne wiha bûya dê navek wiha xweş bidana sedema jiyanê? Li aliyê din, şibîna gotinên ; jan, jin, jîn jî balkêş in. Çima ewqas dişibin hev, ev hersê navên jêneger? Ya ku bi gotin û bihîstina wan wek pêlên bayê xwe li ber dilê mirov dibe û tîne çi ye? Çima dema em li ferhenga kurdî mêze dikin ev hersê hevokên dîn bifirê dikevin ji nava rûpelan û li jor tevî deştên jiyanê difirin? Bersiv gelek in lê jixwe way we got, ez ê derbas bibim. Pêwendiya xwe bi vana ve heye an tune ye nizanim lê tîp û beşa ferhengê ya ku ez herî pir jê hez dikim jî 'J' ye, 'Je'… Jale (gul) vedibin dema em dibên J, jiyan dest pê dike, jan dibin jîn, jin bi periyên xwe yên jankuj li cîhanê belav dibin.

Geryan jiyan e, jiyan jî geryan. Carna mirov li heft bejahiyan (qitayan) li xwe digere, carna li ferhengan, carna li xaçeriyan, carna li xêzikên nava destên xwe, carna li nexşên baskên perperokan; lê tim li xwe digere, li hezkirî, heval û dostên xwe jî… Ku geryan nebe dê mirov zengarî bibe. Hingê wateya ronahiyê jî, ferheng, rê û bajarên jî namîne. Lê ku geryan hebe, her tişt digihîje wateyek felsefî, her der dibe warê baharê. Bimînin di geryanan de. Geryan xweş!

## 'Destê xwe ji zarok û jinan bikşînin'

Jinên endamên Mala Gel bi munasebeta 23'yê Nisanê li ber TBMM'yê hatin cem hev û tecawiza li Sêrtê pêk hat bi birxistin û daxuyanî dan çapemeniyê. Komê, xwest ku Wezîra Dewletê ya ji Malbat û Jinan berpirsiyar Aliye Kavaf îstifa bike.

Li ser navê komê Dîlşad Aktaş, daxuyanî xwend û diyar kir ku li Tirkiyeyê milyonek zarokên karker hene. Aktaş, anî ziman zarok rastî tacizê tên û divê 23'yê Nisanê neyê pîrozkirin. Aktaş, da zanîn ku biryara veşariya ya danî ser dosyaya tecawiza Sêrtê, dixwazin sazî û gel bêdeng bikin. Aktaş, wiha axivî: "Em zarokên xwe teslîmî we nakin. Destê xwe ji zarok û ji me jinan bikşînin. Em dê 1'ê Gulanê ji bo zarok û jinên maxdurê şîdetê li qadan bin" **ENQERE**

# Rojnamegeriya Kurdî li rojhilatê Kurdistanê pêr, duh û îro

**Yekemîn çapxaneya ku karê rojnamegeriya kurdî kiriye li bajarê Urmiyê bûye jê ra "Çapxaneya Xêyret" digotin. 1913'an li bajarê Xoyê 'Rojnameya Kurdistan' dest bi weşanê kir. Di dîroka rojnamegeriya Kurdistanê de piştî M. Bedirxan ew rojanameya duyemîn bû ku li ser axa Kurdistanê ji dayik bû**

KAKŞAR OREMAR

Bi qasî ku bê bîra min benda 15'an ji daxuyaniya cihanî ya mafê mirovan wiha dibêje:

a) Herkes mafdar e ku xwedî miliyet be.

b) Kes nikare tu kesekî bi daxwaza xwe (an jî bi îrade û tena serê xwe) ji miliyeta xwe an jî mafê guherandina miliyetê bêpar bike.

Ev zagon li Îranê xwedî biçûktirîn biha jî nîn e. Çima?

Li gor piraniya nasyonalîstên Iranî tenê 'Fars' netewe ne û yên din jî wek 'qewim' têne binavkirin. Ji 75 milyon nifûsa hemû Îranê, rêjeya nifûsa Farsa ji sedî 48 in û ya neteweyên din jî azerî, kurd, belûç, ereb, tirkmen û hwd ji sedî 52 ye. Di ferhenga siyasî a Iraniyan da 'qewim' ê komên biçûk ên etinîkî ku hejmara wan pir kêm û di dirêjahiya dîrokê da ne xwedî dewleteke serbixwe bûne û ne jî zimanê wan ê xwendin û nivîsandinê hebûye.

Ev siyaseta şovenîst û mezhebî ji çaxê Sefewiya dest pêkir û heya roja îro jî berdewam e.

Ji bo bidestxistina nasnama xwe ya neteweyî, siyasî û belkî di cih da be ku mirov bêje li Îranê kurdan zêdetirîn kar û xebat kirine. Bêguman zêdetirîn fîdakarî û xwîn jî di vê riya dirêj da kurdan pêşkêşî doza azadîxwaziyê neteweyên Iranî kirine. Li dijî vê siyaseta Sefewiyan cara yekê mîrê kurdan '**Emîrxanê Lebzêrîn**' bi dirustkirina kela **Dim-Dim** şerekî dijwar da meşandin.

Bi hatina Qacariyan ra Şêx Ubeydulahê Nehrî konferansa serok eşîret û mezinên kurdan çêkirin û şerekî dijwar di navbera kurd û qecera de, destpêkir. Hevgirtina her du imparatoriyên osmanî û qacarî li dijî şoreşa kurdan nehişt ku Şêxê Şemzînî bigehe armancên xwe.

Herçiqas ku siyaseta înkar û îmhakirina kurdan dijwartir dibû, siyaset jî li rojhelatê Kurdistanê germtir dibû. **Cefer Axayê Şikak** doza **Şêx Ubeydulahê Şemzînî** domand, lê ew jî mîna ên berî xwe hate xapandin û teror kirin. Cihê wî serokê kurd ê naskirî '**Simkoyê Şikak**' girt. Wî şoreşeke nû û berfirehtir da destpêkirin, lê xala balkêş ew bû ku vê carê ji bo zindîkirina kesayetiya kurd a tehqîrkirî, pêngavên mezintir hatin hilanîn. Bi destûra wî çapxane kete karê çapkirinê û yekemîn çapxana ku karê rojnamegeriya kurdî kiriye li Urmiyê bû ku jêra 'Çapxaneya Xêyret' digotin.

Di sala 1913'an de li bajarê Xoyê '**Rojnameya Kurdistan**' dest bi weşanê kir. Di dîroka rojnamegeriya Kurdistana mezin da piştî "Kurdistan"a M. Bedirxan ew rojanameya duyemîn bû ku li ser axa Kurdistanê ji dayik bû. Komela bi navê '**Cihandanî**' hate damezrandin û ji her karekî girîngtir bo yekemîn car di rojhilatê Kurdistanê da xwendingehek li bajarê Xoyê hate çêkirin û xwendevanên kurd dest bi xwendina dersên bi zimanê kurdî kirin. Serkêşê tevayî van karên dîrokî Ebdulrezaq Bedirxan bû ku bêguman piştgirî û teşwîqa lîderê kurd Simkoyê Şikak li pişta van pêşdeçûnên mezin bû. Jiber ku li gel Simko endamên malbata '**Bedirxaniyên Cizîra Botan**' wêdê qedrekî bilind bûn. Ger ew nebûya Ebdulrezaq Bedirxan bi wê peymana hevkariyê a ku di navbera Iran û Tirkiyê da hebû, li nav sinorên Iranê hatibû girtin û dirustkirin di çaxê ku eskerên Iranî ew ber bi sînor dibirin ku teslîmî rayedarên Tirk bikin, siwar û mêrxasên Simkoyê Şikak bi şerekî giran ew ji destê wan rizgar kirin.

Ferman û pêşniyarên ku wî ji Simko re dikirin, zû dihatin pejirandin. Ji wir û şûnda E. Bedirxan heya roja ku hate şehîdkirin, di jiyanê de xwe gelekî deyndarî Simko dizanî.

Pêngava mezintir li rojhelatê Kurdistanê wê demê hate avêtin ku li pey şerên dijwar zêdetir ji nîva axa rojhelatê Kurdistanê hate rizgarkirin û Simko li paytexa desthilatdariya xwe Urmiyeyê dest bi dirustkirina çapxane û weşandina rojnamekê bi navê '**Kurd**' kir ku serniviserê wê '**Mela Mihemed Turcanîzade Qizilcî**' bû. Di rûpelê yekê yê rojnamê da hertim wiha dihate nivîsandin: '**Meqalatêk menfitî Kurdanî têda bî, werdegîrê…**'

Xetên telefonê hatin kişandin û îdarên dewletî dest bi karê xwe kirin.

Mezintirîn destkefta wê rêxistina siyasî ew bû ku şexsiyeta kurd a şikestî, sivikbûyî û tehqîrkirî careke din mîna gulekê bişikvî. kurd pêhesiyan ku ew jî xwedî ziman û ferhenga xwe ya netewî ne û ger derfet jî ji wan ra hebe, dikarin layêqbûna xwe a desthilatdariyeke dadmendane li ser axa xwe bidene meşandin.




Dirûşma Riza Pehlewî jî mîna a Kemalîstan: '**Yek netewe, yek ziman û yek hakim**' bû. Lê bi ked û xebata kurdan ew proja wî li Kurdistanê rastî şikestê hat. Kesên ku ji wan ra wek" Qewim" dihatin hesibandin, weke miletekî xwedî ziman û çanda xwe a milî hebûna xwe bi wan da selmandin.

Di serdema komara Kurdistan 1946'an da rewşa rojnamegeriya kurdî derbasî qonaxeke zêrîn bû. Ji derveyî weşandina rojname û kovaran, êdî çapkirina pirtûkan, hebûna şano, sînema û radioya herêmî jî bûn sedem ku dewlemendiya ziman û çanda kurdî rûyê xwe yê rastîn baştir derxîne pêşberî ronahiyê. Dîroka edebiyata kurdî a nivîskî eşkera bû û li piraniya mala diwanên Ehmedê Xanî, Hacî Qadirê Koyî, Wefayî û Melayê Cizîrî ketin kêleka pirtûkên pîroz. Helbestvanên milî Hejar û Hêmin, marşa netewî (Ey Reqîb), kovara zaroka '**Helale**' û çêkirina xwendingehan bi şêweyên moderin jiyana Kurda ji her hêlekê ve gûherand.

Wê demê li Tehranê hakimên Fars û kurdan wek: '**xayîn, cudayîxwaz û xûlamên Rusya**' binav dikirin û bi rêya hinek kurdên xwefiroş li dijî bizava kurdan a siyasî dest bi tevgerekê kirin ku biser neketin.

Di çaxê selteneta Mihemed Riza Pehlewî da rojnamegeriya Kurdî tunebû. Ger destûra çapkirina rojnameyek weke Kohistan jî dabûn, tenê li Tehranê bû û nedihiştin ku bi rihetî di nava gel da belav bibe. Ew rojname wek organa fermiya rejîma Pehlewî bi kurdî û farsî dihate weşandin. Dema ku şoreşa kurdên başûr di bin serokatiya nemir Mistefa Barzanî da geş bû, ji bo vemirandina '**agirê bin xuliyê**' li Tehran, Kirmaşan û Urmiyê radyoyên kurdî dest bi belavkirina nûçe, şano û stranên kurdî kirin. Di hemû bernameyan da propaganda "Iranî bûnê" mercekî bingehîn bû û herkes jî nedikarî di wan saziyan da kar bike. Her tişt ji sedî 100 di bin kontroleke dijwar da bû. Êdî wê demê ji ber rewşa siyasî a kurdan wek: '**Îranîyên herî esîl, Arîyên herî kevnar, mêvanperwer û…**' dihatin binav kirin, lê ger kesek ji kurdan li dijî eskerekî rejîmê fîşekek biteqanda, li Kurdistanê bi operasyonên mezin ter û hişk bi hev re dişewitandin. Terora wan heya başûrê Kurdistanê jî çû. Ger name bi zimanê kurdî bihata nivîsandin, li postxanê berî ku bigehin destê xwediyên xwe dihatin vekirin û xwediyên nama dihatin girtin û heta di bin işkenceyên giran da dihatin kuştin jî. Ger li malekê an jî di destê kesekî da belavokek bi zimanê kurdî bihata dîtin, qedera xwediyê malê tenê mirin bû.

Wê demê miletê serdest û bilind tenê 'fars' bûn û bi fardî axaftin îftixareke mezin bû!!.

Li wilayetên Kirmaşan, Îlam û Sine siyaseta asîmîlekirinê hêdî hêdî biser diket. Lê bextewerên şoreşa gelên Iranê li sala 1979'an rê li ber vê armanca Pehlewî ya gemar girt.

Rejîma îslamê bi ked û xwîna gelên Iranê hate ser kar. Kurdistan azad bû, lê tenê nêzî du sala ew azadî berdewam bû. Atmosfêrê tijî reşahî û serkûtkirina gelan şikest, lê kişandina tama azadiyê zêde nedomî.

Wê demê pirtûk, kovar, heftename û rojanameyên bi zimanê kurdî hebûn, lê piraniya wan ên rêxistinên siyasî bûn ku wêdemê ên herî aktîv '**HDK.Iran, Komele, Çirîk Fedayî û hwd**' bûn.

Şerê di navbera Iran û Iraqê de jî hêlekê û şerê di navbera partiyên rojhelatê Kurdistanê û komara îslamî da jî bi sedem ku ji bo bêdengkirina kurdan sê kovar li Tehran û Urmiyê dest bi weşanê bikin: Li Tehranê **Amanc û Awêne**, li Urmiyê jî kovara **Sirwe**. Lê weşandina van kovara di bin çavdêriya wezareta ferheng û êtlaata Iranê da bû û gotarên ku biçûktrîn bêhna kurdîniyê û mesajên siyasî têda hebûna, diketin goristana arşîvê. Radio jî xwedî rewşeke wiha bûn. Wê demê Seher TV'yê jî çend saeta di rojê da bi zimanê kurdî weşand dikir, lê dema li sala 1988'an şerê du dewletan bidawî bû, ew bernamên kurdî jî êdî neman.

Piştî ku Mihemed Xatemî ji Tebaxa sala 1997'an heya Tebaxa 2005'an bû serokkomarê Iranê, di jiyana rojnamegeriya kurdî de jî bizavayek nû dest pêkir. Li wilayetên Urmiye, Sine, Kirmaşan, Loristan, Îlam û Kurdistana Xurasanê

Bi sedan rojname û kovar ji aliyê rewşenbîr, komele, saziyên çandî û xwendekarên zanîngeh û zankoyan de dest bi weşanê kirin. Ew germahiya ku di bizava siyasî a bakurê Kurdistanê da hebû, li rojhelatê Kurdistanê jî kete nava gel. Riheke nû kete ber jiyana rojnamegeriya kurdî û teşwîqa ji bo xwendina zimanê kurdî jî sal bi sal zêdetir bû. kurda di çarçova zagûna Iranê a bingehîn de daxwaz kirin ku zimanê kurdî jî bi awayekî fermî li xwendingeh û zanîngehan bê xwendin. Ji hêla din jî hinek Farsên şovenîst û Panîranîstên faşîst ev daxwazên kurdan wek '**pêngavên destpêka cudaxwaziyê**' binav dikirin û bi tundî li dijî dewleta M. Xatemî disekinîn.

Kar û xebata rojnamegeriya kurdî di rojên destpêka serokkomariya Mehmûd Ehmedînejad rastî qedexekirinê hat. Sal bi sal ew meydan li ber karê rojnamegeriya kurdî tengtir kirin. Bi awayekî ku niha heta yek rojname jî bi zimanê kurdî li Iranê nayê weşandin!!. Ehmedînejad çendîn cara li parlmana Iranê bi aşkira ji fraksioyna parlmenterên kurd ra gotiye: '**Vira ne Tirkiyeye û heddê xwe bizanîbîn…**'




Niha rewşa ragehandin û siyaseta kurd li Iranê tirajîke. Piraniya rojnamevan û çalakvanên mafê mirovan li rojhelatê Kurdistanê hatine girtin û tawana wan a herî mezin jî: '**mirovên empiryalîzimê, hevkarîkirina partiyên dijberî şoreşa îslamîya Iranê, şerê bi Xudê ra, casûsî û hwd**' bûne. Kesên wiha li gor zagûna Iranê rastî **şikenceyên ruhî fîzîkî, zindanên domdirêj û heta îdamê** jî tên.

Di roja îro da mirov rihet dikare bêje ku heta '**rojnamegeriya nîv azad**' jî li Iranê tune û kesên ku bixwazin di vê qadê de bixebitin jî, neçarin berê bîr û ramanên xwe sansûr û piştre jî pênûsa xwe bêxin gerê. Gotarên ku berjewendiya kurdan têde hebe, tên pejirandin.

Ji herêmên kurdan li wilayeta Xurasanê ra 'Kurdistana Xurasanê' jî tê gotin.



# Serkêşên têkoşînê mêvan 'pêşwazî' kirin

**Resam Nevîn Gungor li Navenda Çandê ya Ciwanan a Cegerxwîn pêşangeheke bi hêmaya 'Azadiya Min di Nasnameya Min de Veşartiye' ve kir. Di pêşangehê de wêneyên jinên pêşeng ên têkoşîna azadiyê cih digirin**



Resam Nevîn Gungor di çarçoveya Konferansa Jinên Kurd a Navneteweyî de bi hêmaya 'Azadiya Min di Nasnameya Min de Veşartiye' ve kir. Pêşangeha wêneyên Gungorê bi beşdariya jinên ji bo konferansê hatine Amedê pêk hat. Di pêşangehê de wêneyên serkêşên têkoşîna jinê ya ji bo azadiyê cihê xwe girt.

Resam Nevîn Gungor di çarçoveya Konferansa Jinên Kurd a Navneteweyî de ku ji aliyê Tevgera Jinan a Demokratîk û Azad tê organîzekirin pêşangeheke wêneyan vekir. Pêşangeh li Navenda Çandê ya Ciwanan a Cegerxwîn bi beşdariya ji Almanyayê Suheyla Qazî, ji Amerîkayê Prof. Kajal Rahmanî, ji Mirsê rojnameger Doreya Awnî, parlamenterê DEP'ê ya berê Leyla Zana, Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk Yuksel Genç û delegeyên konferansê yên ji 4 parçeyên Kurdistanê û jinên BDP'î hate vekirin.

**'Em li ser axa xwe ne'**

Leyla Zana ku di vekirina pêşangehê de axivî, anî ziman ku Amed malovaniya konferaseke bi vî rengî dike û wiha got: "Amed mala hemû jinên kurd e. Niha em hemû li ser axa xwe ne."

Zanayê anî ziman ku jin û ciwan bi salan in ji bo nasnameya xwe têdikoşin û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Jinên kurd bûn stêrên Rojhilata Navîn û di vî warî de ji bo hemû cîhanê bûn mînak. Ev asta ku îro jinên kurd bi dest xistiye me tevan bextewar dike." Zana li ser girîngiya hunerê jî rawestiya û wiha got: "Huner hin caran di wêneyekî de, hin caran di çav de dibe qarakter."

**Wêneyên pêşengên têkoşînê**

Di pêşangehê de wêneyên pêşengên têkoşîna jinê yên kurd ku jiyana xwe ji dest dane hatine cihkirin. Wêneyên Zekiye Alkan, Leyla Qasim, Leyla Bedirxan, Meryem Xan, Eyşe Şan, Rewşen Bedirxan û gelek pêşengên din ên serkêşiya têkoşîna jinê ya ji bo azadiyê kiriye di pêşangehê de cihê xwe girtiye.

Pêşangeha ku ji 30 wêneyan pêk tê û hêmaya 'Azadiya Min di Nasnameya Min de Veşartiye' lê hatiye barkirin dê heta 30'yê nîsanê vekirî be.

Piştî axaftinên hatine kirin Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî pêşangeh ziyaret kir û tevli kokteyla ji bo Konferansa Jinên Kurd a Navneteweyî bû. **AMED**

# David Lynch ji xweşikatiyê hez nake

Derhenêrê fîlmên Otobana Winda, Mirovê Fîl, Dune, Qedîfeyê Şîn David Lynch, ku di heman demê de resam e jî; li Stenbolê pêşangeheke ji wêne û gravûran pêk tê vekir. David Lynch ji xweşikatiyê hez nake û rengan pir rasteqîn dibîne.



David Lynch, ji tiştên xweşik hez nake û rengan pir rasteqîn dibîne, her tiştekî mirov û tiştên ecêb ên mirovan, riziyatî, zêdehiyên maneviyat û madiyatê di xeyalên xwe de kirine amûrên afirenerîyê. David Lynchê bi vî rengî afireneriya hunerê daye ber xwe li Stenbolê pêşangeheke ji wêne û gravûran pêk tê vekiriye. Pêşangeha David Lynch heta 29'ê gulanê de li Artaneyê vekirî bimîne. **STENBOL**

# Dersa 'Dibistana Azad' fizîk bû



**"Dibistana Azad" ya ku ji aliyê TZPKurdî ve bi armanca pêşvebirin û hinbûna kurdî hatiye avakirin di hefteya 3'yemîn de dersa fizîkê da.**

**"Dibistana Azad" di hefteya 3'yemîn de dersa fizîkê da. Dibistana Azad her hefte roja şemiyê di saet 11.00'an de li baxçeyê Navenda Çand û Hûnerê ya Ciwanan a Cegerxwîn perwerdehiya kurdî dide. Di dersa vê hefteyê de endamên Meclîsa Bajar, Rêveberiya BDP'ê ya Bajar û navçeya Baglarê û endamên TZPKurdî beşdar bûn. "Dibistana Azad" di dersa xwe ya vê hefteyê de mijara Fizîkê da. Dersa ji aliyê mamosteyên TZPKurdî Yildirim Arslan ve hate dayîn, bi mijara neynîkê dest pêkir. AMED**

# Ji bo derhenêrên jin peroşa xelatê dest pê kir




Di 13'mîn Mîhrîcana Fîlmên Jinan a ji aliyê 'Uçan Supurge'yê ve tê organîzekirin de ji 11 welatan 13 fîlm dê ji bo Xelata Federasyona Nivîskarên Sînemayê bikevin nava rikberiyê. Ji Tirkiyeyê jî fîlmên bi navê 'Ji 11'an re 10 Maye' û 'Yên li ser pirê' tevli rikberiya ji bo xelatê dibin.

Fîlmên ku dê di 13'mîn Mîhracana Navneteweyî ya Fîlmên Jinan a Uçan Supurgeyê de bikevin nava rikberiyê hatin aşkerakirin. Mîhrîcan di navbera 6-13'ê gulanê de li Enqereyê pêk tê. Ji Almanya, Meksîka û heta Kanadayê, ji 11 welatan 13 fîlm dê ji bo Xelata Federasyona Nivîskarên Sînemayê (FIPRESCI) bikevin nava rikberiyê. Tirkiye jî di vê rikberiyê de dê bi fîlmên 'Ji 11'an re 10 Maye' û 'Yên li ser pirê' tê temsîlkirin.

13'mîn Mîhracana Navneteweyî ya Fîlmên Jinan a Uçan Supurgeyê bi piştgiriya 24 televîzyonan pêk tê û di beşa 'Her Yek Rengekî Cuda' de 13 fîlm dê ji aliyê jûriya FIPRESCI'yê ji Tirkiyeyê Ceylan Ozçelik, ji Fransayê Dominique Martinez û ji Almanyayê Kirsten Liese pêk tê bêne bijartin. FIPRESCI ji nava fîlmên ku ji Cannes, Venedîk, Locarno, Tribeca û deverên cur bi cur tevlî rikberiyê bûne yekî hilbijêr e û fîlmê hêjayî xelatê tê dîtin di dawiya mîhrîcanê de dê bê aşkerakirin. Mîhracana Navneteweyî ya Fîlmên Jinan a Uçan Supurgeyê, mîhrîcana herî serkeftî ya jinan e ku xelatekî wisa bi prestîj dide.




**Fîlmên xelatgirtî…**

Her wiha di çarçoveya mîhrîcanê de fîlmên xelatgirtî jî dê bêne nîşandan. Fîlma ku derhenêriya wê Almut Getto kiriye Girêdayî Te me (Close to You, 2009) ku Almanyayê temsîl dike ji Max Ophulsê, Xelata Temeşevanan girt. Fîlma derhenêra çînî Xiaolu Guo ya ku bi hevpariya Ingîlîstan, Almanya û Fransayê pêk hatî, Keçîkeke Çînî ji Mîhrîcana Fîlman a Locarnoyê xelata Pilingê Zêr girt. Fîlma derhenêra Awusturyayî ya bi hevpariya Fransa, Almanya û Awusturyayê pêk hatî, Mucîze (Lourdes, 2009) li Mîhrîcana Fîlman a Venedîkê di serî de Xelata FIPRESCI'yê 4 xelat girtin. Fîlma Sarah Watt a bi navê Saleke Min a Bêseks (My Year Without Sex, 2009) ji aliyê Yekitiya Derhenêrên Awusturyayî ve hêjayî xelatkirinê hatibû dîtin. Fîlma derhenêr Cherien Dabis a bi hevpariya Amerîka û Kanadayê pêk hatî, Amerîka (Amreeka, 2009) piştî girtina Sedam ji bo erebên li Amerîkayê dijîn 'Xewna Amerîkayê' vedibêje. Û ev fîlm par di Mîhrîcana Fîlman a Cannesê de di Beşa 15 Rojên Derhenêran de hêjayî Xelata FIPRESCI'yê hatibû dîtin.

**Fîlmên dê bikevin rikberiyê**

Di beşa 'Her Yek Rengekî Cuda' de fîlmên ku dê bikevin nava rikberiyê, balkêş in. Ji 13 fîlman 7 jê yekemîn fîlmên derhenêran a dahûrandî (kurmaca) ne. Derhenêra îranî Shirin Neshat bi fîlma Jinên bê Zilam (Women Without Men, 2009), fîlma ji Amerîkayê beşdarî rikberiyê dibe Di Navbera Me de (Between Us, 2009), fîlma Sonja Wyssa holandî Bêdengiya Zivistanê (Winter Silence, 2009), Ji Çermê jî Hurtirtir (Can Go Through Skin, 2009), Pênc Rojên Bêyî Nora (Five Days Without Nora, 2008), Mal (Home, 2008) hin ji fîlmên derdikevin pêş in.

**Ji Tirkiyeyê 2 fîlm**

Di mîhrîcanê de ji Tirkiyeyê 2 fîlm dê beşdarî rikberiya ji bo xelatê bibin. Yek ji wan fîlman a Pelîn Esmerê; Ji 11'an re 10 Maye (10 to 11, 2009) ku ji gelek mîhrîcanan bi xelat vegeriya ye. Pelîn Esmer beriya niha bi fîlmên Koleksiyonvan (Koleksiyoncu, 2002) û Lîstik (Oyun, 2005) hatibû nasîn.




Fîlman din jî ya Asli Ozgeyê, Yên Li Ser Pirê (Men on the Bridge, 2009)bi hevkariya Tirkiye, Almanya û Holandayê hatiye çêkirin. Di fîlmê de çîroka sê zilaman li ser Pira Tengavê li hev tîne. Asli Ozgeyê bi vê fîlmê par ji Mîhrîcana Fîlman a Stenbolê xelata 'Fîlmê Herî Baş' girtibû. **ENQERE**

www.arsivakurdi.org

Rupel 12+++++++++++NNNUUUU:Layout 1 24.04.2010 14:03 Page 1

ROJEV
25 Nîsan 2010 Hejmar: 26 Sal: 1

## Giringiya tîrêjên rojê ji bo mirovan

Li gora lêkolînekî ku nû tê meşandin giringiya tîrêjên rojê ya ji bo mirovan çiqas baş e tê lêkolînkirin. Di lêkolînê de derket holê ku hinek xwendevan bi şev ders dixebitin û bi roj jî radikevin û ev jî vê yekê derdixe holê ku ji tîrêjên rojê bê par dimînin. Her wiha li gorî vê lêkolînê ew xwendekarên bi roj radikevin di aliyê biyolojîk de bandorê li ser laşê wan dike û carnan dibe sedemê nexweşiyan û sîstama wan ya xewê tevlîhev dibin. Hinek made di nava tîrêjên rojê de hene di aliyê biyolojîk de alîkarî didin laş û hormonên xêwê di laş de zêde dike. Her wiha zayaran bi riya van ceribandinan mirovan hişar dikin ji bo bi roj ne nivin û demê xewa xwe tevilhev nekin. **STENBOL**






# Ligel bêderfetiyan serkeftinên mezin

Ji bo Tîma Basketbolê ya Ciwanan a Baglarê ku ligel derfetên kêm serkeftinên mezin bidesxistine, merasîmeke pîrozbahiyê pêk hat. Tîma ciwanan a Baskebolê ya Baglarê di nava 79 bajaran de bû duyemîn





Şaredariya Baglarê, di Şampiyoniya Anatoliyê de di nava 79 bajaran de li Tirkiyeyê bû duyemîn. Bi vê wesîleyê ji bo ku serfkeftîna tîmê bê pîroz kirin merasîmek hate lidarxistin. Di şahiyê de Şaredara Baglarê ya Amedê Yuksel Baran axivî û diyar kir ku tîma Baglarê ligel hemû bê derfetî û kêmasiyan serkeftinên mezin bidest xistiye.

Tîma Basketbol ya Baglarê a Amedê di qada Basketbolê de îmze avêt serkeftinên mezin û herî dawî jî di Şampiyoniya Anatoliyê de di nava 79 bajaran de bû duyemîn û hêjayê xelata madalyaya zîv hate dîtin. Bi armanca ku serketifina Tîma Ciwanan a Basketbolê ya Baglarê pîroz bikin merasîmek pêk hat. Merasîm li Salona Sporê ya Girtî a Baglarê pêk hat. Serokê BDP'ê Amedê Nîjad Yaruk, Şaredara Baglarê Yuksel Baran, Cigirê Şaredariya Kayapinarê Mahmut Dag, Serokê Diyarbakirsporê û nûnerên navendê Bulent Baykara, nûnerên STK û endamên meclîsa Baglarê jî tevli merasimê bû.

Di merasîmê de şaredara Baglarê Yuksel Baran axiftinek kir û balkişand ser serkeftinên mezin ya Tîma Basketbolê ya Baglarê. Baran wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di qada sportîf de ligel ku derfetên me gelek kêm bûn me serkeftinên mezin bidest xist." Her wiha Baran balkişand ser 23'yê Nîsanê Cejna Zarokan a derbasbûyî û got ku qaşo li Tirkiyeyê roja zarokan tê pîrozkirin lê mixabin îro zarokên kurd cejna xwe di paş deriyên hesinî de pîroz dikin. Lê niha gelek zarok li vir in. Ez dîsa jî cejna zarokên me pîroz dikim. Niha gelek hevalên we di girtîgehan de ne. Ji vir şûnde jî çi ji destê me bê em ê bikin. Ji bo zarokên me tişta herî baş çi be em ê wê bikin. Em ê hêj îmzeyê biavêjin gelek projeyan."

**'Serkeftin bi pere pêk nayê'**

Piştî şaredara Baglarê Yuksel Baran, serokê BDP'a Amedê Nîjad Yaruk axaftinek kir û destnîşan kir ku ji ber vê serkeftina ciwanan gelek kêfxweş bûne û spasiyên xwe pêşkêşî Şaredariya Baglarê kir. Yaruk wiha berdewam kir: "Li Amedê serkeftinên ku ciwan bidestxistin me kêfxweş dike. Serkeftinên mezin bi pereyên mezin pêk nayê. Bi derfetên kêm û nêzîkatiya me ya li hemberî sporê em serkefitinan bidest dixin. Em girîngiya sporê ya di civakê de dizanin."

Piştî axaftinan plaket dan sporîstan. Her wiha piştî merasîma plaketan jî koma Muzikê ya Dîcle Firatê derketin ser dikî û stranên xwe pêşkêşî temaşevanan kirin. **AMED**

# Ji sedî 50 goştê qaçax dixwin

Sekreterê Giştî yê Odeya Beytaran a Hatayê Nesîm Rende, diyar kir ku li Tirkiyeyê di sektoriya sewalvaniyê de pirsgirêkên mezin hene û wiha got: "Li Tirkiyeyê goştê sor ji sedî 50 qaçax e. Êdî goştê ker û hespan bi mirovan didin xwarin"

Beytarên Hatayê, bi munasebeta 24'ê Nîsanê Roja Beytarên Cîhanê çeleng danîn ber abîdeya Ataturk. Di merasima çelengê de Sekreterê Giştî yê Odeya Beytaran a Hatayê Nesîm Rende, diyar kir ku li Tirkiyeyê pirsgirêkên sektoriya sewalvaniyê sal bi sal mezintir dibin. Rende, anî ziman ku ji ber bêrêxistinî û bêkontrola sînorên Tirkiyeyê gelek sewalên nexweş û qaçax derbasî Tirkiyeyê ten kirin û wiha got: "Ji sedî 50 nifûsa Tirkiyeyê goştê sor ê qaçax bikar tîne. Ev yek di daneyên hikûmetê de jî hene. Ji ber bihayê goşt zêde bûye, êdî goştê ker û hespan bi mirovan didin xwarin. Êdî qalîteya goşt nemaye." **HATAY**

# Şaredariya Tetwanê dest bi paqijiya Gola Wanê kir

Piştî Şaredariya Wanê niha jî Şaredariya Tetwanê ji bo ku peravên Gola wanê paqij bikin xebat dan destpêkirin. Di çarçoveya xebatan de hemû cop hatin berhevkirin û derxistin devreyî bajar.

Şaredariya Tetwanê bi armanca ku pêşî li qirêjiya dora gola Wanê bigirin xebata paqijiyê dan destpêkirin. Xebat dê çar rojan bidome. Beriya paqijyê Cîgirê Şaredariya Tetwanê Nîmetullah Epozdemîr axaftinek kir û diyar kir ku sedema qirêjiya Gola Wanê ya sekere ew e ku ava kanalîzasyonê tevli golê dibe û got ku ji bo ku pêşî li vê qirêjiyê bê girtin hemû tedbîran digirin.

Epozdemîr wiha dirêjî da axaftina xwe, "Me wekî şaredariyê kapasiyeta xwe ya tesîsê ya ji sedî 80 yî pêk dihat me kit ji sedî sed. Me pêngaveke girîng avêt. Em ji hemû gelê xwe hesasiyetê dixwazin. Ger ku pêşî li vê yekê bê girtin dê baş be. Bi vî awayî em ê gola xwe winda nekin. Em ê mîraseke baş ji bo zarokên xwe bihêlin."**WAN**



# Li Bazidê lehî rabû

Li navçeya Agiriyê ya Bazidê, ji ber barîna baranê ya zêde lehî rabû û di encama wê de gelek xanî û dikan di bin avê de man.

Li Bazidê şiliya ku roja berê dest pê kir bû sedema lehiyê. Her wiha herî zêde jî taxa sanayiyê ji vê yekê para xwe girtin û gelek mal û cihên kar di bin avê de man.

Şaredara navçeyê Canan Korkmaz diyar kir ku şiliya zêde rê li lehiyê vekiriye û di encamê windahiya can tuneye. Korkmaz got ku xesarên maddî derketine holê. Korkmaz der barê mijarê de wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ekîbên me demildest mudaxaleyê serdagirina avê ya malan kir. Ligel vê dê di encana lêkolînekê de xesarên welatiyan bê tespîtkirin." **AGIRÎ**

# Baydemîr şampiyonê cîhanê pîroz kir

Ciwanê kurd Ozan Berken Bîndak di 8'emîn Şampiyoniya Tekvandoyê ya Cîhanê ya Ciwanan de ku li Meksîkayê pêk hat de bû şampiyon. Şaredarê Bajarê Mezin a Amedê Osman Baydemîr serkeftina Bîndak pîroz kir û zêrek jî wekî xelatê hêjayî wî dît.



Baydemîr li ser sefketina Bîndak sekîni û diyar kir ku giringiya ku didin sporên salonan dê bidomînin. Sporîstê Tekvandoyê Ozan Berken Bîndak di rojên borî de bi Dîskîspor a Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê re peyman îmze kir. Sporîstê Tekvandoyê Bîndak bi 73 kîloyê kete pêşbirkê û di 8'emîn Şampiyoniya Tekvandoyê ya Cîhanê ya Ciwanan de bû şampiyonê tekvandoyê.

Şaredar Osman Baydemîr bi nûnerên Tekvandoyê yê navendê Fatîh Hîllez re çû serdana Bîndak û zêrek û kulîk jî dan Bîndak. Hîllez axaftinek kir û diyar kir ku cara yekemîn ne ciwanekî Amedê dibe şampiyonê cîhanê û ji bo vê jî ev 5 sal in ked tê dayîn. Hîllez anî ziman ku di vê serkeftinê de keda kê derbas bûye, spasiyên xwe pêşkêşî wan dike û got ku hêviya ew ê ku dê hêj di projeyên din de jî serkeftinan bidest bixînin.

Baydemîr bi lêv kir ku li dijî serkeftina Bîndak kêfxweş bûne û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji vir şûnde jî em ê girîngiyê bidin sporên salonan." Piştî axaftinan jî Baydemîr, serokê klûba Dîskîsporê Av Metîn Kilavuz, Sekreterê Gitşî Abdullah Sevînç bi Bîndak re wêne kişandin. **AMED**

# Li Gundikê Melê kursa berikan vebû

25 jin li kursa berikan a şaredariya Gundikê Melê dixebitin û alîkariya aborî didin malbatên xwe. Kurs meha borî ji hêla şaredariyê ve hate vekirin. 25 jinên ku tevlî kursê dibin hem pîşeyê hîn dibin û hem jî perwerdehiya giştî dibînin. 12 dezgah hene û jinan motîfên cur bi cur berikan dixemîlinin. Ji bo îstîhdamkirina jinan şaredarî hîn projeyên din jî amade dikin. Ji bilî kursa berikan 3 projeyên din jî hatine amadekirin. Şeniyên Gundikên Melê ji projeyên civakê keyfxweşiya xwe nîşan didin. **ŞIRNEX**

# Kalê 95 salî zewicî

Li navçeya Girê Sor a Rihayê kalê 95 salî yê bi navê Şukru Adiguzel ku xwediyê 3 zarok û 17 neviyane bi cînara xwe ya 57 salî ya bi navê Salîha Geyîk re zewicî. Adizguzel anî ziman ku hevsera wî 20 sal berê miriye.

Şukru Adiguzel piştî ku hevsera wî Bedriye Adiguzel ku dayika sê zarokan bû di sala 1990'î de mir tenê ma. Piştî ku hevsera wî mir ew tenê ma û heta niha jî tenê jiya. Zarokên wî jî her yek li bajarekî cuda diman û li ser vê biryar da ku ji nû ve bizewice. Şukru Adiguzel bi jina bi navê Salîha Geyîk (57) re biryara zewacê da. Adiguzel bi Salîha Geyîkre mehra fermî çêkir. Adiguzel der barê xwe de wiha got: "Piştî ku hevsera min mir, zarokên min li min mêze dikirin. Lê zarokên min jî zewicin û çûn bajarên din. Li ser vê ez tenê mam. Min biryara zewacê da. Salîha xanim li taxa me dima. Her tim alîkarî dida min. Em bi hevre axivîn û me biryara zewacê girt. Me dawet çênekir. Ji xwe ne li gorî me bû. Ji ber vê me tenê mehra xwe ya fermî çêkir." **RIHA**




www.arsivakurd.org